


BERBANG

KOVARA FEDERASYONA KOMELÊN KURDISTANÊ LI SWÊD



KÎNA RES Û HAVÎNA SOR



BERBANG

Kurdisk tidskrift, utges av Kurdiska Riksförbundet. Ansvarig utgivare och Redaktör: A. Tigris
Layout och sättning : Cotkar och Gundi.

ADRESS

Kurdiska Riksförbundet Rissneled
ed 55, NB
172 44 Sundbyberg/ Sweden

Prenumeration: Medlemmar 50 kr.
/ år övriga 100 kr/ år
Postgiro: 643880-8

BERPÏRSIYAR :

A. TIGRIS

REDAKSIYON :

BAVÊ NAZÊ

S. QERECDAX

C. ŞERO

MUËYED TEYIB

BRÎNDAR

PERGALA RÛPELAN

COTKAR Û GUNDÎ

BERBANG

Kovara kurdi, xwedi: Federasyona
Komelên Kurdistanê li Swêdê
Biha: 5 kronê swêdê
Abone: sal 50 kron

NAVNIŞAN

Berbang, Rissneleden 55 NB
172 44 Sundbyberg/ Sweden
Postgiro: 64 38 80-8

naverok

ZÊWE KÎNA REŞ Û HAVINA SOR3	Kardo Metînî
ME YILMAZ GUNAY BI BIRANI4	
Jinenigariya Yılmaz		Şiyar
Pişa Şoreşger5	A. Tigris
BIRANINA CIGERXWIN		
Axaftina Şevê7	Jî Federasyonê nûnerek
Gula Seyda naçilmise8	Bavê Nazê
Gelê kurd de wi ji birneke8-9	Serdar Holi
DIYAN — BÏYAN — FÛ9	Cigerxwin
PÊŞNIYARÎ jî bo destûra komelên belediyan10-11	Komita Koordine
MÎHRIBAN XATÛNA BERWARÎ Û EVINA JINA KURD11	Bilind Dihokî
DENGÊ RESENE HELBEST A GELÊRÎ12-13-14	Muêyed Teyib
SÊ TÏPÊN ÇAVAN14	Bavê Nazê
SELAHADDÏN EYYÛBÎ 15-16-17	Brîndar
DE RABIN RABIN17	Ahmet Cantekin
JÏ FEDERASYON Û KOMELÊN ENDAN NÛÇE Û BÛYER18	
JÏ KURDÏSTANÊ NÛÇE Û BÛYER19-20	
LECA ZAROKAN21	
FERHENG A BERBANGÊ22	
HELBESTA BI KARÏKATOR23	O. K. —Serdar

KÎNA REŞ Û HAVÎNA SOR

ZÊWE...

Li ser sê gûşa dijminên me nav lê nay sinorê Îraq, Îran û Turkiya, çiyayekî bilind... bilind serê xwe yê hilday. Ev çiyaye her çar werzên "kejen" salê, befir jî kupê wî barnaket. Li danga vî çiyay deşta rast û berîna hey, di dilê vê deştê de bi deha kanî dizin û cû û cûbar li ser sîngê wê dimeşin. Ev deşta mîna zeryeka şeng û şepal salê du car xemla xwe diguhorît. Li destpêka buharê serê xwe bi tîrêjên rojê dişot; gîya û gulyên genimî bejna wê dixemilînin. Li destpêka payîzê serê xwe bi befrê dişot û kirasekê spî li bejna xwe diket û li benda buhareka din dimînit.

Li vê deştê, li navbera Şino-ew bajarê Berzanîyê nemir piştî 50 sala jî xebatê vîyay li wir bêhna xwe vedit- û Ormîyê- ew bajarê Zerdestê mezin serê xwe lêhildayî - li navbera wan herdu bajêrên pîroz, çend gundek hene Navê gundekî jî wan Zêwe ye. Zêwe, rûpelekê sorê dîroka me ye... Zêwe, destana berxwedan û xweragirtina gelê me ye... Zêwe, kîna pîroza dilê me ye!

Piştî gelê me tûşî daketina reş a adara 1975 ê bûy û agirê şoreşa Îlona mezin vemirî, bi hezaran kurd jî stem û zorîya reşîma faşîst a Baxda derbeder bûn û jî "ber bay revîne, ber barovê" deştê jî dijminekî revîn, ketin bextê dijminekê din. Li vî gundî bi sedmalên kurd cî bûbûn. Bi dirêjîya van salan û di ser hemî tahlî û nexweşîya re roj bi rojê bi hêztir bûn û hevîya serkeftinê di dilên wan de geştir dibû.

Li vî gundî zivistanê dibûrî eger sêcar jî nên kurd bi rêka kanîya avê ve sirê ne kuştî ban Li vî gundî bîrsê, sirê û nexweşîya zarok dixwarin. Li vî gundî mîna gelek gund û bajarên vê zemîne eger rojekê rêka MÎROVA-YETIYÊ tê keftî ba da heta ber pêlavên xwe serê xwe şorkit û ne dikarî çavên xwe vekit, li ber şewqa bîrsê û belengazîyê di çavên zarokan de.

Li gundê Zêwe, zivistanê şeş mehîya 85 ê bûrî û li ser tava rojê hemî şinwarên zivistanê di mal in; bi tenê çiyay ne bit, li wir hêştê befir mabû û ezmanê wê digote rojê "min bo te deşt berde lê ez serê çiyay bernadim û ez dê li bend befirêka nû bimînim, çiroka şerê dijwarê xwe û te bû vegêrim."

Li Zêwe, buhar jî bûrî û gundiyan pêşwazîya havînê dikir. Li roja 9/6 xelkê Zêwe mîna her roj jî xew şî-

yarbûn. Jina rêka kanîyê girti bû; pîrejina landikên zaroka dihejandin; kalemêra qelûnên xwe dikişandin, zarok hinda li ber derîya yarî dikirin, hinda jî rêka xwendegehê girti bû da ku enca-

mê sala xwe ya çûyî wergirin. Bû seet neh, dengê tîj û dijwar esmanê şin û ciwanê Zêwe hejand; 8 balafir lêxweyabûn, hey lêva jî agirî û bomban dipirbûn. Wan balafiran kîna reş a dilê faşîstên Bexda girkire ser jin û zarokên Zêwe. Zêwe, di agirî û xwînê werbû, her buhosteka axa Zêwe, parçeyeka leş mirovekî himbêz kir. Ew zarokên di xwendegehê de li bend kartên serkeftina xwe bûn, kartên şahî bûn ê wergirtin û her dilekî hizar hêvî têda şewitîn. Dilê reşê Seddamê xwîn-rêj bi vê tawana hoya mezin jî razî ne bû, roja 1/7 carekê din balafirên xwe şandine asmanê birîndarê Zêwe û dîsan kîna xwe ya reş rête ser gul û kulfîkên axa pîroz a Zêwe û hêştê xwîn a 9 ê Hiziranê ziha nebûy. Hîndî dî xwîn rête ser û havîna keska Zêwe bi xwînê sor kir.

Deng û basên ji Zêwe hatin dibêjin:

* 122 kes şehîd bûn... 79 jê zarok bûn di temenê çîçeka de- 50 zarok jî wan xwendegeha gundî de bûn- yê din jin, pîr û kal bûn.

* 377 kes bi birînen giran ketine.

* 31 Kes bê dest an bê pê an bê dest û bê pê mane.

* 49 Hizanên kurd kes jê nemaye.

Yên jî vê kuştîgehê jî rizgarbûyî derbeder û awarey çol û çiya bûn.

Weheye eger mirov vî xeberî jî yekê bîyanî re bêt, ew pirs bikit "Ewe di kîja cenga çîhanê de bûye?" Hoo bira! eve ne di cengê çîhanê de çêbûye, eve roja 9/6/1985 ê li gundekê Kurdistanê "Îran" ê ku malên pêşmergê Kurdistanê "Îraq" ê li wir xocibûbûn çêbûye û eve ne cara yekê ya ev rijême bi van tawana radibit dijî gelê me û me nebawere eve tawana dawiyê bit. Lê kurd dibêjin "hertîstek jî ziravî dibizdît, bi tenê zilm jî storî."

Bila rejêma faşîst a Saddamî baş bizanît ew bi van tawana agirê şoreş û xebata gelê me geştir diket û dawîya xwe nêzîktir diket.

Hizar silav li gîyanê pakê şehîdên Zêwe û Kurdistanê bin!

Mîrin û rûreşî bo rejîma faşîsta Bexda û dijminên Kurdistanê bin!

ME YILMAZ GÜNEY BI BİRANI

ME YILMAZ GÜNEY BI BİRANI

FEDERASYONA KOMELÊN KURDISTANÊ LI SWÊDE, DI ROJA 06.10. 1985 AN DE LI SERBAJARE SWÊDE LI STOCKHOLMÊ BI PÊKANINA ŞEVEK, SALVEGERA MIRINA PÎŞEKARÊ MEZIN YILMAZ GÜNEY BI BİRANI

BERÎ ŞEVÊ FEDERASYONÊ, EW TAXÊN KU KURD LI WIR DIJÎN BELAVOK BELAV KIR Û AFÎŞÊN ŞEVÊ DALKAND.

SALONA ŞEVÊ BI FOTOGRAF Û AFÎŞÊN YILMAZ GÜNEY, HAT XEMLANDIN. BELAVOK LI WÊ DERÊ JI HATIN BELAV KIRIN. JI PIRTÛKÊN YILMAZ GÜNEY, RAXISTINEK (SERGÎ-UTSTALLNING) HAT VEKIRIN.

HEMÛ KESÊN BEŞDARVAN, JI BO GIRAMI Û BİRANINA YILMAZ GÜNEY, ŞEHÎDÊN KURDISTANÊ Û CIHANÊ DEQÎQEK LI PİYAN RAWESTAN. LI DU GIRAMIYÊ SEROKÊ FEDERASYONA KOMELÊN KURDISTANÊ, LI SER JÎNENIGARIYA YILMAZ GÜNEY AXAFTINEK KIR. JI KOMÎTA KARGER HEVALEK JÎ, LI SER PÎŞA YILMAZ A SÎNEMAYÊ, GOTAREKE RABERÊ GUHDAR Û TEMAŞEVANAN KIR. EM WAN HER DU GOTARAN LI JÊR RABERÊ WE XWENDEVANAN JÎ DIKIN.

PAŞÊ FÎLIMA KU YILMAZ GÜNEY SENARYOYA WÊ NIVISANDI BÛ Û DI FESTÎVALA "CANES-82" YAN DE DIYARIYA ZÊR GIRTÎ BÛ; FÎLIMA "YOL" HAT TEMAŞEKIRIN. BI KEMASÎ QASÎ 300 KESÎ CAREKÎ DIN FÎLIMA "YOL" TEMAŞE KIRIN!

JÎNENÎGARA YILMAZ GÜNEY

ŞIYAR

Yılmaz Güney, di 47 saliya xwe de, di roja 9 ê Îlonê 1984 an de li Parisê çavên xwe li jîhayê girt û çû ser heqîya xwe. Me, ew di jiyana mirovatiyê ya herî ciwan û herî girîng de wenda kir, ku di vê demê de wî xwe nûjen kiri bû û dixwest di hunermendî û senetê xwe de dema xwe ya zêrîn bilîze.

Ji aliyê din Yılmaz, di wextekî ku tevgera şoreşger ya Kurdistanê û Tirkiyê hewcedarê wî bû, mir. Mirina wî di tekoşîna li hember faşîzmê, ji bo gelên me valahiyek mezin hişt, ku cihê vê valayiyê dê zor bê dagirtin.

Bêguman mişin ji bo însanan tişteki tabî ye û meriv nikare jê bireve. Lê belê ne mumkun e, ku miriv ji yekê wekê Yılmaz, ku bi nav û xebata xwe qezancek giranbiha gîhand sîneme û edebiyata şoreşgerî, bê qebûl kirin.

Berî her tiştî, mirina wî ya bê wext, di sîneme û senetê şoreşgerî ya Tirkiyê de valayiyek pir mezin hişt, ku dê ci dagirtina wê bi salan bigre.

Yılmaz, jiyaneke pir kin jîya, lê di vê jiyana kin de wî gelek tişt pêk anî. Weke yekê hunermend, ew bi şexsiyeta xwe ya politîk bi berpirsiyariya xwe, ku ji bo çîna kedkar û civatê his dikir û bi tekoşîna

xwe ya şoreşgerî, bû nimûneke herî mezin ji bo hunermendên hemdem û şoreşger.

Bi kêmasiyên xwe jî, ew ne tenê hunermendekî şoreşgerî hemdem, lê belê peyeyekî tekoşer bû jî. Wî, xwe ji bo doza çîna karker û kedkaran avêtî bû nav şer.

Aliyê wî ku em li ser disekinîn, şexsiyeta wî ya hunermendî, jiyana wî ya hunermendî, dîtina wî ya hunermendî û afirandinên wî nin. Aliyê wî yê şoreşgerî ku ji xelkê re bûye mal.

Ew ji nav xelkê derket û cardin ji xelkê re bû mal.

Yılmaz Güney, di sala 1937 an de li gundekî Edenê ku navê wî YENICE ye hate dinê. Malbata wî, malbatek ji yên Kurdistanê bû, ku ji ber kolonyalîstan û politîka wan ya dagerkerî reviyabûn, hati bûn Edenê û li wir bi nan û zîkê dixebitîn.

Zarotî û destpêka xortaniya wî, li Çukurovayê bi xebatên cûrbe cûr derbas bû. Wî, emeletî, şivantî, berdestîya qesap, katibî, bikaranîna filiman û wekî din kir.

Paşê ket sînema Tirkiyê û ji sala 1958 an heta 1972 an bi hindikayî di nêzîkî sed filiman de bi aktîfî çû girt.

Yılmaz Güney, pêşveçûna şiyasî û civakî ya Tirkiyê ji nêz ve taqîp dikir. Ew, bi aktîfî ket nav tevgera şoreşgerî. Ji ber sedemên cûrbe cûr gelek caran hat girtin û ket girtîgehan. Di jiyana xwe de bi te-


mamî 12 sal di girtîgehan de maye. Ev çarîkek ji jiyana wî ye. Ew, di girtîgehan de jî ranewestî, li wir jî tekoşîna xwe bi hin awa berdewam kir.

Bi xwe kurdîbûna wî û di nav tevgera şoreşgerî ya Tirkiyê de raberizandina mesela netewê kurd, di demeke kin de tesûr li wî kir. Wî di pêvajoka wextê de ji bo gelê kurd û li ser jiyana wan ya civakî filiman çêkir. Di demên jiyana xwe ya dawî de, bi doza kurdan a netewî daket û dîtînen xwe diyar kir.

Divê em wek welatparezekî kurd Yılmaz Güney tim bi birbînîn, xwedî li aliyên wî yê şoreşger û tekoşer derkevin û hunera wî û niştîmanperweriya wî biparêzin û berûpêş bibi!

Divê em hêjayiyên ku ji nav gelê kurd derketine di planên navnetewî de jî bidin nas kirin.

Yılmaz di bîra me de ye!
Zor spas!



Lı ser pişa Yılmaz axaftın.

DI WARÊ TEKOSHIN Û PEŞVEÇÛNA CIVAKI Û ÇINI DE GIRINGI Û ROLA SİNEMAYÊ

LI TIRKIYÊ SİNEMA Û BABETÊN WÊ

Wek li her dewletên kapitalist, li Tirkîyê jî, sazgehên sinema yê dî destên monopolên sineman de ne. Ji ber ku li Tirkîyê demokrasiya burjuvazi jî nin e, burjuvaziyên tirk, wek dî her hêl û babeti de, dî hêl û babeta sinemayê de jî, hin jî har û êrişkar e. Bî alikariya sinemayê, bî taybeti bala ciwanan jî pîrsên civaki û çini dîr dixin. Ji hêla doza kurd a netewi ve şoveni û nijadperesti bê hed û bê hesab e. Mirov kare hemû babetên sinemaya tirk dî çend cûran de bicivine:

- * Şer û pefçûn
- * Bengîni û macera
- * Mistitizm û din
- * Şovenizm û nijadperesti
- * Fuhuş û pêxwasi
- * Mêrkuştin û jin revandin... Ûhw...

Lı Tirkîyê, ev filimên ku tîn çêkîrîn hinek jî wan qaşo, pîrsên civaki, abori û yêni kulturî dîgrîn û tînnî perdê. Lê dî bîngêhên xwe de, ew bî zanatî û hostatî gelan jî dozê dîr dixin û çavên wan didî grêdan. Lı ser sedem û encamên doz û bûyeran ranawestî. Mêrkuştin, jin revandin, xızanî û ber bî bajarên mezin ve barkîrîn jî xwe re dîkî babetên sinemayê; lê sedem û encamên wan bûyeran dîsan bî çedera gel ve grê dîdî. Bî zanatî berê kamareyên xwe nadîn sistema dewleta tirk a xwinmêj û rîzi. Ji dewlet û sistema wê re xwedî derdîkevîni û ji bo domandîni û parastîna wê kar û xebat dîkî. Nivîskar, artist û rejîsorê kurd Yılmaz Guney, dî vi wari de şoreş çêkr. Kamara burjuvazi şikand, perda wê ya genî û qîrêj çîrand. Berê kamara xwe da pîrs û pîrgîrêkî civaki, abori, kulturî û bî taybetî ya doza gelê xwe yê kurd.

Ez dîxwazîm, berê hinek li ser rol û grîngiya sinemayê rawestîm û li Tirkîyê, dî hêla problemên netewî û civakî de rewşa sinema tirk çî ye bîdîm diyar kîrîm. U paşê li ser pişe û sinema Yılmaz Guney çend gotîni rabêrê we mîwanan bîkîm.

Lı her derê dinê hêzên karbidest, wek dezgeh u materyalên din, sinemayê jî, jî bo kara pergala xwe bî kar tînnî. U jî aliyê din de, jî bo xapandîni û çavgrêdana çîni û neteweyêni bîndest, dibêjin " sinema, jî bo kêf û dema vala ye." Lê bî rastî, dî bîni de bî metodên hûr û kûr propaganda û fortên sazûmana xwe ya xwinrêj û xwinmîj dîkîm. Lı welatên kapitalist û kolonyalist, bî sinemayê jî serê gel dîşon û wan jî tekoşîni û şerê çîni û netewî dîr dixin. Sinema dî hêla propagandayê de roleke mezin û grîngî dîleyze. Ji bo propagandayê, sinema fersend û îmkanekê gelek mezin, hêsa û fireh e. Sinema du rol bî hev re dîleyze: Hîm rabêrê goh û hîm jî, rabêrê çav dîke. Bûyeran, bî awakî vekîrî û zelal tîne ber çavan. Dî careke de hitabên mîlyonan dîke. Ya herî grîngî li welatên wek Kurdistanê û li Tirkîyê ku xwendîni û nivîsandîni gelek kême, sinema dî hêla perwer de û hîndekariyê de roleke mezin dîleyze. Bî pêşveçûna teknîkê re, sinema jî roj bî roj pêşve dîçe û qad û çarçova xwe fireh dîke. Bêtrî dî van salên dawî de, bî pêşketîna televîzyon û videoyan, sinema jî salonan derket û hate malan.

Xweza, li welatên sosyalist sinema perdeyên xwe jî bo pêşveçûna civakî û abori vedîke. Lı wan welatan sinema jî bo pişaftîna pîrs û pîrgîrêkî civakî û kulturî tê bî karanîni.

Lı welatên kapitalist jî, rêxistîni, sazî û kesên pêşverû û sosyalist, sinemayê jî bo geşkirîni û gurkirîna tekoşîni û şerê civakî û netewî bî kar û xebat tînnî. Kamara projektorên sinemayê jî bo pişaftîni û zelalkirîna wan pîrsan tîn pêketîni û xebîndîni. Dî warê sinemayê de jî şer û tekoşîna van çîni û qadan li humber hev bî şêleke bê bestan û dijwar dom dîke.

YILMAZ GÜNEY Û SİNEMA

Yılmaz Guney, tenê ne listîkvan û rejîsorê sinemayê bû. Ew nivîskar û tekoşerî şoreşger bû jî. Lê ez dîxwazîm dî wê axatîna xwe de bî tenê li ser pişa wi ya sinemayê rawestîm.

Mîrov çaxa bî çavekî lêkolîni û lêgerîni li filim û pişa Yılmaz temaşe bîke û bînêre, sê gehînek (merhele) dibîne. Dî nav van her sê gehînekan de cûdabûn û ferqiyetên gelek mezin û grîngî hene:

GEHÎNEKA YEKEMÎN: EV dem bî kêmasî 10 sal da; dî navbera 1960 û 1970 yi ye. Dî warê pişe û sinemayê de ev dem dema destpêk û xortaniya Yılmaz Guney ye. Dî filimên wi yêni wê demê de li dij zorkeran rîk û kin hene. Lı dij zordariya zorkeran, tekoşîna ferdi û şexsî gelek e. Dîtinên realist û sosyalist kême nî. Bûyer û babetên filimên wi gelek hêsa ne. Lı doza civakî û çîni teng meze dîke. Dî wê demê de tema û babetên filimên wi gelek nêzi filimên kovboyî ne. Lê disa dî filimên wi de taybetîya qerekerên gelên kurd û tirk hene. Yılmaz dîxwaze kedxwarî û zordestiyê bine perda sinemayê, lê dema wi ya zarokî (dî warê sinemayê de) û xortaniyê ye. Zanabûn û tecrûbeyên wi tîr nake. Lı gor wê demê ev rewşa wi gelek normal e jî...

GEHÎNEKA DUYEMÎN: Dî piştî 1970 yi de Yılmaz, gelek pêşve çû û xwe dî warê pişe de gehîştand. Dî hêla sinema Tirkîyê de şoreş çêkr. Wi dî dî nivîsandîna senaryo, listîk û dî çêkirîna filimên xwe de li gor dîtinîna realist a sosyalist li dozê nihêrî û berê kamara û projektorên xwe da ser problemên gel. Bî awêki zanîstî li probleman mîzekekr û wan anî perda sinemayê û rabêrê temaşevanî kr. Yılmaz bî awêki zanîstî, bîngê-

hi, fireh û kûr li probleman mêzêkîr. Dî filma xwe ya "U-MUT" (hêvi) de serfirazi û serketina pişa xwe da pejirandin. İca Yılmaz dî filimên xwe de bî metodên zanisti li bûyeran dinêre tahlil dîke û ji wan re li pişaftinan digere. Edî dî filimên xwe de qehremaniya ferdi rakuriye ya civaki heye. Yılmaz, bî bî zanabûn û bî xebata xwe hin ji pêşve çû û gehiş gehinekeke dîn. Ew jî gehineka sêyemîn e.

GEHINEKA SÊYEMÎN: Belê geli mêvan û guhdarên hêja! Piştî salên 1976-1977 an Yılmaz, dî warê sinemayê de gaveke pêşketiyê dîn ji avêt. Berê kamere û objektîfên sinema şoreşger da welatê dê û bavê xwe, Kurdistanê. Dî wê demê de ew bî xwe dî zindana kolonyalistan de bû. Lê, wî dî zindanê de li ser doza Kurdistanê ya netewî û civakî senaryoyan nivisand û bî alikariya hînek artisên demokrat filimên xwe pêk ani. Yılmaz jî xwe jî berê ve digot "ez kurdeki asimile me." U piştgiriya doza kurd dîkar. Lê, jî niha şûn de li ser Kurdistanê ditinên wî hatî bû guhartin. Li doza welatê xwe bî çavêki zanisti û rast dinêriya. Yılmaz bî nivisandî û çêkirina van filimên xwe yêni dawî darbeke gelek mezin li şovenizm û nijadperestîya tirk xist. Yılmaz, bî filma xwe ya SURU" (Keri), bî pişeya sosyalist a realist pîrs û pûrgirêkên doza kurd ya netewî û civakî ani perda sinemayê û pêşkêşî milyonan kir. Wî, bî vê filma xwe ya ha, tore û birûbaweriyên civaka feodalî li navê raxist û her Çiqas vekirî ne be jî qereker û têkiliyên kolonyalizmê ci bî ci da diyar kirin. Wî, dî filma xwe ya " SURU " de hemû hebûnên sererd û bînerd çawa jî Kurdistanê diçin metropolê, bî minaka kerî da şandin.

Yılmaz bî filma xwe ya "YOL" (Rê) hin jî ber bî Kurdistanê çû. Bî metodên pişa şoreşger a nûjen navaroka filimê dewlemend kir. Cara yek bû, ku dî warê sinemayê de Kurdistan wek welateki cûda û serbixwe hat şandin. Pişekarê mezin, dî filma xwe ya " YOL " de mêtîngêkîrîna Kurdistanê, paşvemayîna wê, ditin û tore yêni feodalî û bî taybetî rewşa jinên Kurdistanê bî awekî gelek vekirî û zelal ani navê.

Wek em pê dîzanîna filma " YOL " dî festîvala CANES-82 an de diyariya zêr girt. Bî diyariya zêr nav û dengê Yılmaz û filma wî li dîmayê belav bû. Yılmaz bî filma xwe ya "YOL" doza gelê kurd ya netewî û ya gelê Tirk a çîni bî cihanê da

nasandin!




....KURDISTANA KU EZ DÎ SERÊ XWE DE ÇÊDÎKIM, KURDISTANEKE YEKBÛYÎ, SERXWEBÛYÎ, Û DEMOKRATİK E... KURDISTANEKE KU HEDEFA WÊ SOSLİZM E....

....BELÊ, EZ BAWER IM KU KURDISTANEK WEHA DÊ MUTLAQA AVA BIBE...

Yılmaz GÜNEY

Herkes axaftinê guhdari dîke.

Beşdarvan dî giramiyê de radiwestin.



MALBAT Û PARTIYA CIGERXWÎN, DI ROJA 20 Ê MEHA 10 AN DE LI BAJARÊ STOCKHOLMÊ DI SALONA MEDBORGARHUSET DE SALVEGERA MIRINA HELBESTVANÊ MEZIN SEYDAYÊ CIGERXWÎN BI AWAKÎ GIRSÎ BI BÎRANÎ!

CIVÎN BI BÎRANÎN Û GIRAMIYA HELBESTVANÊ KURD SEYDAYÊ CIGERXWÎN, HEMÛ ŞEHÎDÊN KURDISTANÊ Û YÊN CIHANÊ VEBÛ. HEMÛ BEŞDARVAN, LI PÎYAN DEQIQEKE RAWESTAN. DÎSA HEMÛ BEŞDARVANÊ CIVINÊ, LI PÎYAN MERSA GELÊ KURD A NETEWÎ " EY RAQÎB " GUHDARÎ KIRIN.


LI GOR PROGRAMA CIVINÊ GELEK KES LI SER NAVÊ REXISTINAN Û LI SER NAVÊ XWE, DI DERHEQÊ JINENIGARÎ, AFIRANDIN, PIŞE Û TEKOŞINA CIGERXWÎN DE PEYIVÎN Û BIRÛBAWERÎ-YÊN XWE DÎYAR KIRIN.

DI CIVINÊ DE HELBESTÊN SEYDAYÊ CIGERXWÎN BI KURDÎ, TIRKÎ Û BI SWÊDÎ HATIN XWENDIN. FÎLÎM HAT ŞANDIN Û TEMAŞE KIRIN.

LI SER NAVÊ KOMÎTA KARGER A FEDERASYONA KOMELÊN KURDISTANÊ LI SWEDÊ JÎ, JI KO-MÎTA KARGER A FEDERASYONÊ HEVALEK PEYIVÎ. EM, WÊ AXAFTINA HEVAL LI JÊR RABERÊ WE XWENDEVANÊN XWE YÊN DELAL DIKIN:

BÎRANINA CIGERXWÎN

axaftina şevê



Geli heval û mêvanên giranbihal!
Hevalê axaftvanên berî min, ji her ali ve jînenigar û pişa helbestvanê mezîn Seydayê Cigerxwîn girtin û birûbaweriyên xwe raberên me kirin. Ji ber vê yekê jî, ez naxwazim, dûr û drêj bipeyvim. Lê, ez dixwazim bi kurtebirî di derdeqê tekoşin û helbestên Seydayê Cigerxwîn de çend gotin bibêjim.
Cigerxwîn ji malbateke xizan û ji netewekî bîndest bû. Ev her du bûyer û sedem Cigerxwîn kir helbestvanê tekoşer û hêja! Ya herî girîng çaxa Cigerxwîn nav û deng da ji gelê xwe û ji çîna xwe dev ber-neda. Hinek kes dema di pişa xwe de digihine ciyekî bilind û dibin xwediyê nav û deng ji gelê xwe, ji çîna xwe dûr dikevin û bes di meclisan de xwe bi pozbilindî şandidin, ji derê pesn û fortên xwe pê ve tiştê nakin. An jî ji xwe de dev ji doza gelê xwe û çîna xwe ber didin. Lê, Seydayê me, ji van her du rîyan jî,

berê xwe dagerand. Berê xwe da ser rîya rast. Heta mirîna xwe di rîya doza Kurdistanê de û bi karker û gundiyan xizan re meşiya. Bi wan re jîya.
Mezîni û hêjabûna Cigerxwîn yek jî, jê ev bû; ku di bin mercên kolonyalizmê û zorkeriyê de li ser axa xwe weki hinek nivîskar, pişekar û helbestvanên kurd yên din bi zimanê kolonyalistan nenivîsand. Bi zimanê qedexekirî, bi kurdi nivîsand U bi zimanê gelê xwe banga wê ya şerê û tekoşinê kir. Di wî wari de Cigerxwîn gelek serfiraz bû. Wî, bi zimanê gel û bi awakî gelek hêsa û sivikî propagandayê kir. Cigerxwîn bû evin û kete dilê ker kurdeki welatparez û tekoşer. Wî, pişê, dirok û zimanê kurdi jibo şiyarbûna netewî û civakî kir navgînê propagandayê. U Cigerxwîn wek hinek kesan xebata wêje (edebî), çandî û xebata siyasî jî hev cûda nekir. Wî, hemû xebat û afrandinên xwe yên wêje û çandî jî

bo xebata siyasî bi karani.

Hêjabûn û meznayîya helbestvanê kurd Cigerxwîn, yek jî ev bû; ku di rojên gelek teng, tari û zor de ne diket bê hêvi û bê gumaniyê. Di rewşên wilo gelek xirab de hin jî pê nûsa xwe tûj dikir û dengê xwe bilind dikir. Di helbestên xwe de metoda diyalektîk bi kar daniya. Bi hêvi û bi bawerî di helbestên xwe de tekoşinê geş dikir. Halanan li karker û xebatkaran didan. Rîya rîzgariyê di tekoşinê de, di tekoşinêke rêxistinî de şan dida!
Geli hevalan!

Bi rasti Cigerxwîn gelek tişt jî me re hişt. Ew bi me re ye! Îro jî ew di nav tekoşina me de ye!



Li gora, ku dibêjin êvara çêbûna helbestvanekî, yan nivîskarekî dengê ji dût tê û mîlet bi xwe şîyar dike bivan peyvan: " Hê gelf xelkê îşev hunermen-dek ji we wê bi ser rûyê erdê û bilindbûna behrema wî bi we ve girêdaye. Ji bo wilo divê hûn çend dilopan ji xwîna xwe û piçek dilovaniya dilê xwe bidênê!"

Dema gel helbestvanê xwe tîne ser rûyê erdê, herkes ji mîletê wî berê xwe pê ve dike û doza veğerandina deynê xwe dike. Helbet hunermendê rast û durîst, bi destekî vekirî û bi dilekî paqij xwe dispêre mîletê xwe û berhemên xwe diyarî wî dike...

Di vî warî de wê gotinên me di cîyê xwe de bin heger ez bêjim, ku helbestvanê me yê mezin Cigerxwîn bi herhawî wek mîletperwer û wek helbestvan suxra gel û mîletê xwe kir...

... Belê gelê kurd çikustî û destengî bi kurê xwe re Cigerxwîn nekîr, dako ew bibe hostê gotinê. Belê bi comerdî xîst bin qeşema wî turasekî gelêrî dolmênd, dîrokek kevnare yê ku bi serê keç û kurên xwe ave kirî bû. Di warê xurîstî de ji bergehên spehî çî ji robarên bi xum-xum û çîyayên bi serfirazî û payetî bilind û çî zevî û panavên bêsinor fireh berçavên wî kirî bû. Helbestvanê me necefilî û tîrsê rîya xwe di dilê wî de nedît. Ji bo wilo bi mîrxasî li nav Kurdistanê gerîya. Li devê rîya xwe de pêrgî parsek û belengazan bû; dolmênd

û maqulan hat.. Hêsrên wan, kenên wan, zordestî û hejartîya wan dît. Wî ji di helbestên xwe de bi wan re kenîya, bi wan re girîya û hêsrî barand.. Berberî bi sitekaran re kir, hevalbendî bi çîna bindest kir... Bi vî hawayî Seydayê Cigerxwîn bi gelê xwe re çîrik talî dît û bi wî re xweşî û nexweşî daqurtand.. Loma ji şairê me cîyê xwe di dilê mîlet de girt...

Seydayê Cigerxwîn cîyê xwe di dilê mîlet de girt, lewrw bi mîrxasî û bi dilê şî di efrandinên xwe de ew da ber çavan û ew belû kir. Seyda ketibû dilê gelê xwe, lewra destê xwe danî bû ser birîna wî û bi herhawî dixwest derman bike.. Seyda ket dilê mîlet û helbestên wî di nav de bela bûn, tevî ku rojekê ji rojan helbestek wî ne di rojnamekê û ne di kovarek resmî de hate belav kirin.. Erê Seyda bû bi nav û deng, tevî ku dîwanên wî bi dizî li welat dihatin çapkirin û bi dizî dihat xwendin.. Ev jî Tracîdyek mezin û girane ji helbestvanê ku berhemên wî qedexene li welatê wî û derdek nu tevî derdên gelê wî dibe...

Belê berhemên Seyda li welatê wî qedexebûn, lêbelê mîlet helbestên wî ji dev dikirt û benda peyv û hevokên wî yê şêrî dima.. Û ev bû xelata mîlet ji helbestvanê wî re.. Ma jî vê xelatê şîrintir?

.. Kurdistan bi çîya, newal û deştin. U navê Seyda li herçî ji van cîyên welêt bû bi nasîn û bi deng.. Dibe ku yek bipirse: Eger Cigerxwîn wiha bi nav û deng bû, mane xwe ew di xweşiyê û geştyê

de dijîya û mir?

Bêguman kesê hunermendê welatperwer mefhumiyetek taybetî li ser xweşyê û ne xweşiyê li cem heye.. Dibe, ku yê helbestvan xweşya xwe dibîne di hevokê spehî de. Dibe jî ku ew şahîya xwe dibîne dema bi hezaran keç û xort helbestên wî bi stranan li hev vedigerînin..

Lê xweşî û geşî bi mefhunekî teng li cem Seyda rîya xwe ne dîtin.. Helbestvanê me yê mezin ji roja xwe naskir, rehetya xwe ne dît. Kêm ji helbestvanên çîhanê, mîna Seyda girtin, lêdan û çîrik talî dîtî ye.. Lewrw hêzên reş ên ku Kurdistanê di nav xwe de perçe kirine ne tenê şîrên wî qedexekirin, lê bi herhawî hawildan kirin ku jiyana Cigerxwîn lê bikin jehr...

Belê Seyda niv qernî ji jiyana xwe di zindan, sergonyê û gera bêneçarî di çîya, qelaç û newalên Kurdistanê de buhirand. Lê tenê niha, piştî ku dilê wî yê mezin rawestyaye û laşê wî yê tahr di bin axa welatê çî ji xwe re girtîye, Seyda maye parîstin ji êşkenceyê û girtinê.

Bi çîrik talî em dibêjin, ku ev bûye salek Seyda ji nav me çûye.. Kurdistan di roja çûna kurê xwe şînyê û gelê kurd li ser tîrba wî bi heybet serê xwe nîzm dike. Tenê hêvîyek me heye ku êvara mirîna Seyda dengê ban kirîye ku helbestvanekî nuh wê di nav gelê me de rabe, bêguman tuxmê berhemên Seyda wê di helbestên wî de hebin. Bi vê yekê emê karîbin bêjin: " SEYDA GULA TE NA ÇILMISE!"

GELE KURD DE WÎ JÎ BÎRNEKE

Di dîroka wêjeya gelê me de çewa ku ji berî çend setsalendeyê yekî wek Melayê Cizîrî, yekî wek Feqîyê Teyra, yekî wek Ehmedê Xanî û h.w.d. ku nâyên ji birikirin û heta roja îro jî gelê Kurd bi helbest û sitranên wan di şîr û şahî û dîlan û govendên xwe de wan di jiyîne, Cigerxwîn jî yek ji wan kesa ye ku heta gelê Kurd hebe dê sitran û helbestên wî ji devê biçûk ûkal, keç û xortên me nekeve.

Divê em gelek serfirazbin ku çewa li welatek mêtîngeh wek Kurdistan, bê radyo, bê televizyon, bê dibistan û heta ku zîmanê wî yê zîkmakî lê hatiye qedexekirin û yekî wek Cigerxwîn xwe li ber hemu kir-

yarên dijmin pik kirîye û ji rikî didmin ji gelê xwe re ango ji me re heft dîwan hiştîye.

Lewra ji ber vê yekê ye: ji Diyarbekir bigrin heta Silêmanîyê û Mahabadê gelê me wî bi giramgirî di dilê xwe de di jiyîne û dê bi jiyîne.

Çewa ku gelê Şîlîyê bi Paplo Nerûda, gelê Tirkîyê bi Nazim Hikmet û gelê Fîlîstîn bi Mahmûd Derwêş serbilindin em jî bi navê Cigerxwîn û afirandinên ku ji mere hiştîye wilo serbilind û bextiyarin.

Cigerxwîn ne ozanê gelê xwe bi tenê bû, wî xwe ozanê hemû gelên bindest qebûldikir. Çewa gazîdikir Reşîka û di got: "Win reşîkin ketine bindestan

SERDAR HOLÎ

em jî sipîne mane perîşan" û xelasiya me û wan û hemû bindestên dinê di yekîtiyê û hevkarîya gelan de di dît, wer jî heskirîyê îdeolojîya çîna karker û hîmdarên wî Marks û Lenîn bû. Ew parêzvanê gerûya hêvîya bindestên dinê Yekîtiya Sovyetê bû.

Wî gazî karker û rençberên welatê xwe dikir û di got: "Ulmê Marksîst bi xwînin rastîyê tê de bibînin". Belê bi vî awayî ji bo fêrbûna Marksîzmê rê şanî wan di da û xelasiya

wan di îdeolojîya sosyalîzma zanîstî û destbirakî ya serkêşê sîstema sosyalîst Yekîtiya Sovyetê de di dît.

Cigerxwîn ji qewirandin û

surgûnkirina dijmin çavên xwe ne dişkand. Wî hemû jiyana xwe amadeyî vê rêyê kiribû. Bê tirs bê westan gelek caran birçî û tazî, gelek caran di bin zulm û tada dijminên gel de bê molet xebata xwe di domand heta roja ku çavên xwe li jîyanê girt.

Ew yek ji wan kesa bû ku di nav lepên xizani û bêkesiyê de serê xwe ji dijmin re ne di tewand, pênuş di destan de gund bi gund bajar bi bajarên welatê xwe di gerîya hoy û rewşa gelê xwe bi çavên xwe di dît û bi hunermendî kî mezin bi helbestên xwe ve tanî ziman.

Dijî axa, û şêxên xwefiroş radiwesta û bangî karker, gundî û rênçberan dikir di got: "Bese êdî dem hatiyerabin heta kengî em ê hestiyê ber nigê sega bin" Belê wî baş dizanî bû goştê me kî dixwe û hestiyên mayî kî di (dikoje) kurisîne. Lewra jiber vê yekê bû wilo di qerîya.

Cigerxwîn, ne bi tenê helbestvan bû, ew dirokna, mamostê û têkoşerek mezin bû. Têkilîyên xwe bi hemû hêz û rêxistineñ Kurdistan'ê ve datanî. Li kîjan perçê Kurdistan'ê tevgerê çebûbûna wî bazdida alîkarî ya wan û bi hemû hêza xwe di bû xizmetkar ji tevgerê re. Lewra wî baş di zanî bû "dest rakirin fereca xerîye".

Lê çî mixabin ozanê gelê Kurd, yê setsala bîsta, yê herî mezin yekî wek Cigerxwîn ku çewa gelek caran di mala wî de nan tune bû ku bi xwarna. U me jî di seyran û civînên xwe de helbest û sitranên wî qîr di kir û bi serê wî sond dixwar.

Di xwazim li ser tenêti û bêkesiya Cigerxwîn buyerek ku di serê wî re derbas bû ye xwendevana pê haydar bikim. Ne di wextek gelek dûr de, di sala 1978 a de Kurdek li Sûriyê diçe sertêdana Cigerxwîn. Dema di keve hundir di bîne ku Cigerxwîn bi nexweşiya Tifo

yê ketiye di nav nivîne de ye. Çuye doktor, doktor jê re gotiye "Divê heta çend roja ji derwî mast tu xwarin nexwî ancax tê başbî". Lê çî mixabin deh lîra di berîka ozanê me de tunebûye ku ji bo derman sê kîlo mast ji xwe re bikire. Ev bûyer carekî wer qewumyê û merivekî bi çavên xwe ew rewşa ku Cigerxwîn tê de bûye dîtîye. Lê kî dizane wî di 82 sal emrê xwe de çî perşanîtiyan dîtîye. Ewana di dilê xwe de weşartîye û bi xwe re birîye gorê.

Gelo ma. Cigerxwîn di 82 sal emrê xwe de rojê pênc lîra bindanaserhev û çav bera malê dinê da na ew jî wek hineka dê ne bûna milyoner? Lê wî nekir hemu hebûna xwe di rêya şoreşa Kurdistanê de feda kir. Yên pê re jîyîne çêtir dizanin.

Wexta meriv piçek bi fikir, meriv dê nebêje: "Gelo Cigerxwîn ji bo çî çû li welatê biyanî li Swêd mir". Ku daxwaza wî ya davin ew bû li welatê xwe di nav gelê xwe de bimre. Ma qey di nav bîst milyon Kurdî de çî jê re nemabû. Lê çî fêde me ew jî ne anî çî.

Jiber vê yekê bila kes loma li kes neke. Di vî warî de gunehên me tevan hebûn. Ji xwe jî niha pêve em çî bibêjin tewşe.

Bi kurtayi, Cigerxwîn 82 salên xwe di rêya şoreşa Kurdistanê de ji bo gelê xwe bûrand û çû heqîya xwe. Lê belê, divê em ji bûyera Cigerxwîn ders bigrin û qe nebe li yên mayî xwedî derên.

Daxwaz ewe ku em wan gortin û şîretên wî yên giranbuha di serên xwe de bi çî bikin û ew rêya ku emrê xwe têde da bi domînin heta roja xelasîyê.

Ji bo ku ew jî di gorê de bi dilek rihet razê.



diyan

biyan

fu

*Diyan - biyan - fu, Diyan - biyan - fu!
Linge koledar ji ser te rabû.*

*Kuren te gernas xwe dane kuştin,
Navek pr bilind ji bo te hiştin
Tipen azadi kuştin koledar
Noşican bi, te xwina wi vexwar
Dema ku serê koledar dişki
Nizanim çima Dala dipişki
Ci le teng dîbi, gurê dev bi xwin.
Serê wi dêşe dwê esprin
* * * * **

*Diyan - biyan - fu, Diyan - biyan - fu!
Hewrê koledar ji hev bela bû.
Ewi hewrê krêt tev reş û tari
Zor û brçibûn tim jê dibari
Bayê azadi, Sewra Oktobir
Ev hewrê tari ji hev bela kr
Dengê Hoşî-Min pr xurt û hîner
Waye lédidi saeta zafer
Dilê te ragurt lasir li te kr
Li dûjmin bûyi hêtûna agir
Dil û perişan tipê koledar
Li ser sînga te mane brindar
* * * * **

*Diyan - biyan - fu, Diyan - biyan - fu!
Li koledaran te barand tîfû
Dema tu gurtin tipên azadi
Azadixwada teva kr şadi
Çepik dikutan bi deng û qerîn
Teva digotin bji Hoşî-Min
Serxweşi dane hev hemi koledar
Gerek bixeydîn Seid û Bayar
Ji xew şiyar bûn, roja me hilhat,
A wan çû ava, dema me va hat.
Pirani emîn, ji xwe em xurtin
Çerxa tarihê nayête girtin
Ey sermayedar! bê ol û bê wîdan
Di bin lingê we dikeli volkan
Çiye ev kuştin, çiye xwinxwari?
Li her deri tîfû li we dibari...
Bîdîn destê me heqe me temam
Em şer naxwazim me dwê selam!*

PÊŞNIYARÎ

ji bo destûra komelên belediyên

Hevalên hêja!

Bî vê namê re em destûra ku me hazir kirbû ji we rê dîkin. em dixwazin ku hûn destûrê berçava derbaskin û kêmasiyên wê tespît bikin.

Her ûsa bî vê namê em we gaziya civinê dîkin. Dî civinê de emê li ser xalên jêrin bisekinin:

* Informasyon li ser karûbarê Komisyonê ku heta iro kiriye.

* Diyarkirina ditinên komelan û komitan derheqê rêxistinîya Federasyonê ya nû.

* Hilbijartina komisyonên avakirina komelên di belediya Stockholmê de.

* Ditinên komele û komitan derheqê destûra komelên ku wê bî avakirin.

* Pêşniyari li ser programa komelan a xebatê.

* Pirsên din ên pratik.
Dî gel silavên hevalti!

DESTÛRA KOMELA KURD LI.....

Roja civinê, şemî 9. 11. 1985 seet: 12.00
Ci ABF Stockholm Sveav. 41 Beskov salen

DERTÛRA KOMELA KURD LI.....

1- NAV Û QADA XEBATÊ

Navê komelê, Komela Kurd li.....
Qada xebata komelê.....

2 - QEREKTERÊ KOMELÊ

Komela kurd li komeleke demokratik e û bî rêxistinên siyasi ve ne girêdayiye.

3-ARMANCA KOMELÊ

a- Kurdên ku di belediya de di bin baskên xwe de bicivine û wan temsil bike.

b-Kurdan di derheqê civata Swêd de agahdar bike û di pirsên civaki de alikariya wan bike.

c- Ji bo pêştebirina û belavkirina çanda kurdi û zimanê kurdi xebat bike.

d-Ji bî pêşteçûna ciwanên kurd bixebite û ji bo wan imkanan hazir bike.

e-Ji bo helkirina pirsên jinên kurd bixebite.

f-Ji bo pêşteçûna zarokên kurd bixebite û imkanan hazir bike û weki zarokên kurd karbin zimanê xwe yê zikmaki di dibistanan de bixwinin.

g-Alikariya multeciyan kurd bike û wan di derheqê mafên multeciyan de agahdar bike.

h-Swêdiyan di derheqê pîrsa kurd û Kurdistanê de agahdar bike û piştgiriya wan bistîne.

i-Piştgiriya tekoşina miletê kurd li her çar perçên Kurdistanê li hember zordestiyê bike.

j-Tevi karûbarên federasyonê bike.

4- BI CIANINA ARMANCÊN KOMELÊ

a-Dî gel mercên resmî, rêxistinên civaki danûstendin dayine.

b-Ji bo karûbarê agahdari, belavok belev bike, konferans, semineran hazir bike, weşanên giştî bî kar bine, kursan veke, şevên çandî û piştgiriya amade bike, gera hazir bike.

c-Ji bo pêşdebirina ciwanên, kurd û hazirkirina imkanan, seksiyonekê ciwanan di hundirê komelê de saz bike.

d -Ji bo helkirina pirsên jinên kurd seksiyoneke jinan di hundirê komelê de saz bike.

e-Ji bo çareserkirina pirsên din (weki pirsên zarokan, pirsên multeciyan, pirsên ziman û çand) komitan saz bikin.

5- ENDAMETÎ

a-Kesên ku destûr û armancên komelê qebûl bike, dikare bibe endamê komelê.
b-Endam divê li gor imkanên xwe tevî karûbarên komelê bibe.

c-Endam divê heqê xwe yê endametiya bide. Yê ku endametiya xwe nedane, mafê wan yê dengdanê û helbijartinê tune.

d-Mafê her endamê ku 16 sal xilas kiriyê, dengdanê û helbijartinê heye.

e-Endam divê li belediya de an jî di belediyeke cînar de ku komela kurd tune ci girtibe (rûniştibe)

f-Komita karger muracata endametiya qebûl dike, an red dike. Yê ku muracatê wi hatiye red kirin, dikare pîrsa xwe bine kongrê.

g-Komita karger wê derheqê endamê ku li dij prensibên komelan kar dike, biryarên jêrin bigire

* Bal kişandin

* Cemîdandin

* Ji endametiya derxistin

h-Mafê her endami heye ku di kongra komelan de xwe biparêze.

ORGANÊN KOMELÊ

6-KONGRA KOMELÊ YA SALEWEXTÎ

a-Kongra salewexti organa komele ya heri mezin e. Salê carekê di meha de dicive, endamên komele wê mehekî berî kongrê, jî kongrê û jî rojeva kongrê bî agahdar kirin.

b-Mafê her endami heye, pêşniyaran pêşkeşî kongrê bike. Divê pêşniyar bî nivisandin û du hefte berî kongrê têkeve destê komita karger.

c-Biryar bî piraniya besit tî girtin.

d-Kongre bî piraniya endaman (%51) dicive. Ger piraniya endaman (%51) di kongrê de hazir nebin, kongre mehekî tehir dibê. Dî civina nû de kongre bî endamên hazir vedibe.

e-Rojeva kongrê divê jî xalên jêrin pêk bibe.

* Hejmartina endaman û vekirina kongrê

* Hilbijartina diwanê

* Xwendina raporên organan

* Munaqeshe li ser raporên û rûspi kirin

* Endameti

* Tespîtkirina heqê endametiya

* Munaqeshe li ser destûrê gor mada 10 an dibê

* Biryar li ser pêşniyaran

* Hilbijartina serokê komelê

* Hilbijartina 4 an 6 endamên komita karger

* Hilbijartina 2 cigiran ji bo komita karger

* Hilbijartina endamên komita çavder 3 esl, 1 cigir

* Hilbijartina nûnerên federasyonê

* Pirsên din

* Dawî.

KONGRA ISTISNA

a-Ger K. Karger biryar bigire an jî, jî 1/3 yê endaman bî nivisandin bixwazin kongra istisnaya dicive.

b-Divê endamên komelê 14 roj berî kongrê jî kongrê û jî rojeva kongrê bî agahdar kirin.

c-Kongra istisnaya li ser esasên kongra salewexti dimeşe.

8-KOMITA KARGER

- a-Komita karger dı navbera kongra komelê de berpırsyarê karûbarê komelê ye.
- b-K. Karger ji 5 an 7 esl û ji 2 cigiran pêk tê.
- c-K. Komita Karger berpırsyarê cıvınan, bıryarên kongrê û cıvına endaman e.
- d-Komita Karger dı nav xwe de sekreter û sekreterê mali hildıbjêre.
- e-Komita Karger ji 15 rojan careki dıci-ve. Serok an du endamê komita karger dıkarın komita karger gazi cıvınên istisnayı bıkın.
- f-Serok û sekreterê mali bı hev re hesabê komelê ya banqê dıbinın.
- g-Ger komita karger dı hin rewşan de nıkarıbe bıryar bıgre, ji ber ku deng qası hev bıın aliyê dengê serok qezenc dıke.
- h-Komita Karger, komite û berpırsyarên kar hılbıjarê (weki komita çandi, berpırsyarê infermasyonê û hwd)
- i-Endamê komita karger ku nıkarıbe du mehan tevı karê komita karger bıbe, ji endametiya komita karger derdıkeve û şına wi cigrê yekem dıgire. (semester istisnayı ye)
- j-Endamên komita karger ji bo du salan tên hılbıjartın.

9 KOMITA ÇAVDER

- a-Komita çavder, ji 3 endamên esl û ji yeki cigır pêk tê.
- b-Komita çavder, dı cıvına xwe ya yekem de serokê K. Ç. hıldıbjêre.
- c-K. Çavder, karûbarê komita karger û hesabên mali kontrol dıke. Ji kongrê re raporê dınivıse.

10- DESTÛR

- a-Destûra komelê dı kongra komelê de tê gıhartın.
- b-Jı bo guhartına destûrê ji dıngan 2/3 pêwıst e.

11-HATINÊN KOMELÊ

- a-Heqê endametiye
- b-Alikariya xebatê ji beledıyan
- c-Hatın ji karûbarên komelê
- d-Alikari (bexşış)

12WEZİFÊN SEROK

- a-Lı gor prensibên komelê, komelê temsil dıke.
- b-Jı bo parastına yekıtiya komelê xebatê dıke.
- c-Komita karger, gaziye cıvınê dıke û cıvınê idare dıke.

13- WEZİFÊN SEKRETER

- a-Proto kolên komita karger dıgre
- b-Nıvisandınên komelê bı derve re dımeşıne
- c-Arşıva komelê dıgre
- d-Ger serok ne hazır be wezıfeyên serok bı cıh tıne.
- e-Lista endaman dıgre

14 -WEZİFEYÊN SEKRETERÊ MALI

- a-Jı hatın û çıyınên komele ya mali berpırsıyare. Deftera mali dıgre.
- b-Lista malên komelê dıgre û jê berpırsıyar e.
- c-Komkırına heqê endametiye
- d-Jı bo mesrefên zêdeye 500 kroni bıryara komita karger pêwıst e.

15- SEKSIYONA JINAN

- a-Jı jinên ku endamê komelê pêk tın.
- b- Jinên ku endamên komelan ın, dı nav xwe de komiteke hıldıbjêrın.
- c-Seksiyona jinan bes bı pırsên jinan mıjıl dıbe.
- d-Prensibên seksiyona jinan ji ali endamên wê ve tın tespit kırın û ji ali komita karger tın tespit kırın.
- e -Komele bı her awayı alikariya seksiyona jinan dıke.
- f -Organeke komelê ye.

16- SEKSIYONA CIWANAN

- a -Jı endamên komelê yên ku ji 16 he- ta 20 salıyan pêk tın.
- b -Endamên komelê yên ku 16 û 20 sa- line dı nav xwe de komiteke hıldıbjê- re
- c -Prensibên seksiyona cıwanan, ji ali endamên wê ve tın tespit kırın û ji ali komita karger ve tın testiq kırın.
- d -Seksiyona cıwanan, bes bı karê cıwanan re mıjıl dıbe.
- e -Kemel bı her awayı alikariya seksiyona cıwanan dıke.
- f -Organeke komelê ye.


17-FESİHKIRINA KOMELÊ

- a -Dı kongra salewextı an ji dı ya istis- nayı de ji 2/3 hejmarı dıngan tın fesih- kırın.
- b -Hebûna komelê devri federasyona Komelên Kurdistanê lı Swêdê dıbe.
- c -Ger hejmarı endaman dakeve bıne 10 kesan komita karger dıkarı bıryar bıde ku komele fesih bıbe.

Mîhrebana, keça Mela Husênê Berwarî ye. Di navbera salên 1854-1905 an de jiya. Dîbêjin ku Mîhrebana keçeka pîr ciwan, jêhatî û şareza bû, her wesa helbest dîvehand. Rojê mîrê Amêdiyê li gundê wan dîbîte mîhvan. Çavê mîrê Amêdiyê bî mîhrebana dîkevin. Ji Mîhrebana hez dîke û ji bavê wê dîxazît; lê Mîhrebana, evîndara pîsmamê xwe bû. Evca demê ev çende zanî rabû, helbestek û nameyek ji mîrê Amêdiyê re şand û daxaz ji mîrî kir ku ne kevîte dî rêka evîna wê û pîsmamê wê. Çaxê mîrê Amêdiyê name û helbest xandî ji daxza xwe hate xwar û pîrozbahîya Mîhrebana kir. Êdî Mîhrebana û pîsmamê xwe gehîştin hev. Mixabin tenê ev helbeste ya gehîştîye me û ji jîyana wê jî tenê em vê çendê dîzanin. Ev jî bî rêka Seydayê mezin Şehîdê Kurdistanê- ENWER MAÎ- gehîştîye destê me. Eva jêrî ew helbeste ya ku ji mîrê Amêdiyê re şandî.

MÎHRIBAN XATÛNA BERWARÎ Û EVINA JINA KURD

BILIND DIHOKÎ



Ez çî bêjim, çî beyankem
 Kî bî halê min dîzan
 Mexîyata aşkirakem
 Ah jî vî derdê giran

Ah jî dest eşqê evîna
 Keftime tazî û şîna
 Kî dê saxket van birîna
 Çû jî dil sed ax û jan

Derdekê zorê girane
 Eqî û huş min çî nemane
 Mam pepik û bê xudane
 Kê dîye ev çî zeman

Min nema sebr û qerare
 Dil jî min bo pare-pare
 Dozexa pîr ar û mare
 Lew jî min çûn hest û jan

Du dîla yek du hebandin
 Zehmete bêne revandin
 Ayeta eşqê bî xandin
 Na hête şerh û beyan

Eşq nizanîtim gedahî
 Eşq nizanîtin padşahî
 Şu'leke jî nûra îlahî
 Her wekî rûh û rewan.

dengê resenê helbest a gelêrî

Yên ku îro bi zimanê kurdî (kurmançî) dinivîsin gelek in, lê du car min hest bi ciwanî, nazikî, kwîratî û firehîya zimanê kurdî kirîye. Yek demê min pexşanê Sebrî Botanî dixwendin; du demê min romana Şivanê Kurd ya ku Seyda Nureddîn Zaza wergêraye ser zimanê kurdî. Bi rastî Nureddîn Zaza û Sebrî Botanî du şehsiwar in di meydana nivîsînê da û min bawer e nivîsînê wan dê li paşerojê bin bingehê zimanê nivîsînê di kurmançî da.

Rewş û kawdanên ku îro gelê me ye kurd tede dijît, bûye egera hindê ku gelê me li welatê me ye parçe-parçe kirî bi başî hev nas neken û agehdarî hev ne bin. Êdî ez dibînim ku em kurdên li dervey welatî bi taybetî li Ewropa dijîn pêwîst e, bizaveka mezin bikî di vey meydanê da û ev karê heyê girîng berî her kesî dikevtî-te ser milên nivîskaran ji bo ku em agehdarî xebat û pêşkêftina gelê xwe bibînin li her parçeyeka Kurdistanê xweştivî.

Yek ji wan nivîskarên herî heja û bi nav û deng li Kurdistanê Başûr îro helbestvan û rojnamevanê berkeftî Sebrî Botanî ye. Hêvîdar im, bi vî nivîsarê ez bişem hinde layên jî û efrandina wî ji xwendevanên heja ra pêşkêş bikim.

Min Sebrî Botanî, li sala 1978 ê naskirîye û hevalînya me ta sala 1982 ê domkir; ji hingê were ez ji welatî derkeftime û edî hayê min jê nemaye. Demê ez vî nivîsarê dinivîsim tenê du jêder (serkanî) li dev min hene, ew jî dîwana "Şîn û Şadî" û "Dilistan" e.

Êdî helbest ev e, dê bin egera hindê ku kêm û kasi di nivîsara min da hebin. Lewra berhemê Sebrî Botanî ne tenê ev her du dîwan in. Belkî nihe du ya sê pirtûkên din jî çapkirînin, her wesa bi deha nivîsar û vekolîn bi zimanê kurdî û erebî di rojname û kovaran da belav kirîne. Min bawer e, niha jî yê berdeyam e û dest û tilên wî yê pîroz xameyê (qelem) xwe yê zêrîn berdeyamê û bernadit.

SEBRÎ BOTANÎ KÎ YE ?

Di pêşgotina dîwana "Şîn û Şadî" û "Dilistan" da Sebrî Botanî, li ser jîna xwe ne nivîsiye ji ber ku wekî wî bi xwe diyarkirî ku ew dê bi dîr û dirêjî jînegara xwe li cih û demekê din nivîsît. Lê mirov dikarî hinde aliyên jîna wî ji wan her du pêşgotinan derbêxît.

Sebrî, piraniya jîyana xwe li Kurdistanê Başûr û Êraqê derbaskirîye. Niha li Bexda dijît û li rojnameyek kurdî û erebî kardikît. Sebrî, ji maleka hejar bûye û gelek talî û nexweşî di jîna xwe da dîtîye; bigre ji hejariyê, derbederîyê û zîndanê heta bindestî û sîtema dagîrker ewderebega. Yê ku Botanî jî nêzikî nasît, dizanît kanê û çend mirovekê pak û dilsoje û çend evîndarê gel û welatê xwe ye. U çend li ser doza gelê xwe yê mukume. Sebrî Botanî, bi temen û rengê xwe ve kal xweya dike, lê bi dil, can û hîzrên xwe ve jî xortekî xortir e.

Sebrî, li ser destpêka jîna xwe di gel xwendinê di pêşgotina dîwana "Dilistan" da wilo nivîsiye:

"Li hezar û nehsed û sî û şeş, bibûm mîna gulek nû

bişkivî û geş. Dayka min a misilman, aşiqa dîn û îman. Ez birim ber xwendinê, ji bo karê dîn û dinê. Ber

destê melayê pîr, navê xudê tim li bîr. Defterek anî vekir, bi navê xudê despêkir. Dilê min pir pê xweş kir, xwendin li min kir şekir. Seydayê heştê salî, ji pîrtî dînaft. Meha heftê an heştê, rojekê hat ji deştê, hat û kete ser piştê, xudê rêkir beheştê. Babê min e dil bi kul, du bîstên wî bibûn çil. Tîrsa Romê hêj li dil, barê revê li ser mil. Navê wî Ehmê Temer, xwerna wî qehr û keder. Bê mal û Aşiq mêvan, erê û belê ser lêvan. Ez rêkirim Sêgirka, peytextê mar û mişka. Mala Mîro ava bû, ava bû xweş ava bû. Mîro rewşa mîra bû, nimûnê camêra bû. Bi xwe-vexwe rewabû, tekye şev û roja bû. Bijî "Sebrokê" malê, hê berî nîvê salê. Qurana xwe nivî kir, ji seydayf hêvîkir 'ku me hîn ke nivîsê, xêre xwedê binvîsê.' Seydayê xudê kuştî, kar bazbend û nivîştî. aşiq mirîşk û qiroş, dem û gavê şer firoş. Hema bi nav mela bû, rastî derd û bela bû. Çav'î hêk û sabûnê, heta roja rabûnê. Dersên tîrsê digotin, bê agir em disotin. Ewî xudê nehiştî, darfeleqe li destî. Her hejand û rahejand, heta jêhat veweşand. Patik li min herişand, dilê min pê lerizand. Wî dil bi kes nedisot, dar rakir û hat û got: "Hey kurê wî seyê pîs, kê dît mizgeft û nivîs? Nivîs ne karê me ye, dîyanet yarê me ye. Tu hatî nîvê Quranê, pa xelatê me kanê?"

Ez rateqandim hîrço, xwendina min ji min çû. Rast û çûme bajêr, mektep û mizgeft û dêr. Du sal û sê heyv tamam, li malên nasandim. Ez gîham rêza çarê, ne xwezî wê buharê. Min xwendina xwe hêla, ji nû ketim ber pêla. Bê çare û derbeder, derdê welat hate ser. Ji Eşqa welatxanê, min xwe berda meydanê."

Li ser destpêka xwe dinivîsina helbestan da di pêşgotina "Şîn û Şadî" da Sebrî Botanî wilo nivîsiye: (Ji sala 1944 ê ve ez û helbest bi hevra dijîn, lê li sala 1946 ê di zîndana Mûsilê da jîna min di gel vehandinê dest pêdikît... Dost û hevalên min bi xwendina helbestan keyfxweş dibûn, lê ji nivîsîn û helgirtina wan dilgiran dibûn. Car hebû her kaxizek di destê min da dîtûban direvandin û bi lez didirandin. Lê mirov bo xudê hêjît, ev helbest bibûn qaçk û benîştê devê wan. Nemaze ji ber sivikayî û nermîya wan bi sanahî dihatin ji berkirin. U li nav xelkê belav dibûn. Nemaze ew helbestên ku pesnê welat dikirin yan jî siyasî bûna... Ca ji tîrsa ne ji xemsarî û bê sexbêrî ne hatin nivîsandin û helgirtin, her ji lew jî hejmara wan ta ku sala 1957 ê, ji 25-30 parçe şîrên kurt pitir nebû.)

PAŞEROJEKA GEŞ LI PÊŞ XUDANÊ VAN ŞIRAN DÎYARE

Ev gotina jûrî seydayê nemir şehîdê Kurdistanê ENWER MA'Î sala 1957 ê li ser deftera destnivîsa helbestên Sebrî Botanî nivîsî bû. Ya ENWER MA'Î gotî gelek rast bû. Sebrî Botanî, nuke dengê resene di helbesta kurdî da. wehaye eger mirov helbesta Sebrî Botanî û helbesta îro ya kurdî bidit berhev, helbesta Botanî hindek vemayî bit, lê evhevberkîyeyî di cihê xwe da nabit û pêwîst e, mirov bi çavekê din seyrî helbesta Botanî bikît, bi pêpîvên helbesta gelêrî bipîvît. Hingê dê bo me xuyabit ku Sebrî çend dengê resen û bilind

e, her çend ez pitir bi pexşana wî şeydame.

Berhemê Botanî yê çapkirî:

1 ŞÎN û ŞADÎ

Şîn û Şadî, navê dîwana wî ya yekem e. Ev dîwan, di sala 1979 ê da li Bexda çap bûye û di salekê da sê hezar dane ji bazarî hew bûn û careka din dîsa li Bexda sala 1984 ê çap bûye.

Dîwana Şîn û Şadî ya pêkhatîye ji pêşgotinekê û 56 helbestan û li dawîya wê ferhengokek danaye bi kurdî-erebî ji bo şirovekirina peyvên giran. Ev dîwan 264 rûpel e ji qewarê navincî.

Helbestên wê dîwanê... ciwanîya siroştê Kurdistanê, evîndarî, evîndarîya welatî, jîna rênçer û pale û cotkaran, xebata gelê Kurdistanê û gelên cîhanê ji bo azadî, aştî û rigarkirinê, nalîna ji derdê bindestîyê û dagîrkera, bi kurtî jîna bi hemî aliyên xwe ve himbêzkirîye û pêşkêşî xwendevanên xwe kirîye.

Helbesta Botanî, helbesteka xorist e. Her kesekê çend helbestên wî xwendibin edî dikarî ji nava hezar helbestan, helbesta wî nasîkî ev jî nîşana serkeftina wî ye.

Helbesta wî... Çewa çem têne xwar.. Çewa bilbil awaza dixwînin... Çewa berf dibare, wesa sivik û xweş li ser ezmanê mirovî dimeşe. Sebrî, helbestên xwe bi kêşên sivik û serwayên mukum divehînit lewra jî gelek ji helbestên wî bûyne stran û dengbêjên bi nav û deng gotîne mîna MIHEMED ŞEXO, TEMO, GULBUHAR, SEMÎR ZAXOLÎ û gelekên din. her wesa helbestên wî ji zarokan ra gelek sivik û nerm in û gelek ji zarokên Kurdistanê Başûr helbestên wî ji ber dixwînin. Zimanê Sebrî, di bingehê xwe da dîyalekta Botanî ye, lê di gel dîyalekta Behdîmî û peyvên soranî bi hostatî têkel kirîye. Êdî zimankê gelek xweş û ciwan derketîye.

GULBUHAR

DÎ HELBESTÊN BOTANÎ DA

Helbestvanên Sofî di helbestên xwe da evîna keçekê ciwan dikirine sîmbol bû evîna xudê, wekî MELAYÊ CIZÎRÎ demê li ser evîna xwe bû xudê distîrî bi navê Sel wayê yan Selmayê û pesna bejn û bala wê, dêmê wê yê geş û birhên wê yê mîna heyva du-sê şevî. Sebrî jî,

her wesa evîna Gulbaharê kirîye sîmbol ji bo evînek din, lê evîna din ne evîna xudê ye, belku evîna welat, gel û mirovatîyê ye.

Gulbahar denbêjeka pir bi nav û deng e, li Kurdistanê. Dengê wê yê xoş karekî mezin li Sebrî Botanî kirîye, edî Gulbahar û dengê wê bûyne sîmbolê Kurdistanê û piraniya helbestên wî li ser Gulbaharê ne yan jî navê Gulbaharê tede heyê. Li ser vî çendê Sebrî wilo dibêjît: (Her parça "mebest parçên helbestana M.T." tu tu dixwîni bêhna gulê jê têt; Gula hunermend pencerê min e, ez geşatî û spîhîtiya hemî dol, nîzar û çî-yayên Kurdistanê rengîn tîra dibînim, bîstaneka xemildar û xemlandîye. Hemî reng, tuxm û texlîtên gul û gulçîçekên welatê kurda tîda dibînim û bihindikim.)

Sebrî Botanî Gulbahar ne dîtibû, heta sala 1979 ê, hingê Sebrî dît û dilê wî bi dîtina wê geş bû û gelek helbestên xwe pêşkêşî Gulbaharê kirin û Gulbaharê kirin stran.

HELBESTEK JI DIWANÊ ŞÎN û ŞADÎ

GULBAHAR û KEW

GULBAHAR:

Kewo spêdê bixwîne
Her bixwîne her bixwîne
Tu awaza xoş bîne
Her bixwîne her bixwîne
Xelkê rake ji vî xewê
buhar e, xew şîrîn e (1)
Kewo heke tu difîrî
Careka dî dizivîrî
Bersivêka berketî
Bû vî dilê şikestî
Di gel xo bîne hey hewar
Ji wî lawê ne dîyar


KEW:

Hewar e, Gul hewar e
Hewar e, hey hewar e
Qebqeba min hewar e
Warê me her ew war e
Buhar ne ew buhar e
Derdê me pir dijwar e.
Kewê me jî belav in
Bê pîrs û bê silav in
Qeb-qeb rabin ji xewê
Guh ne din vî rew-rewê
Rew-rewa tûle û tajf
Yê ne hûsta bit najî
Qeb-qeb buharê bînin
Bûka kurda b' xemlînin
Qeb-qeb û hey qeb-qebû
Deftî hat û kes ne bû
Qeb-qebû hey qeb-qebû
Ne bi destên min û te bû
Qeb-qebû hey qeb-qebû
Ya me ne vîya ev e bû
Qeb-qeb hey qeb-qebû
Dergehê Şadî vebû

2- DILISTAN

Navê dîwana wî ya duyemîn e. Li sala 1984 ê li Bexda çap kirîye.

Dîwana "Dilistan" ji pêşgotinekê û 24 helbestan pêkhatîye û li dîwanê ferhengokeka kurdî-erebî daniye ji bo şirovekirina peyvên giran. Ev dîwan, 78 rûpel e, ji qewarê navincî.



SEBRÎ BOTANÎ

صبري بوتاني

NIMÛNEK JI DÎWANA DİLİSTAN

Demê dîwana helbestvanê nemir Cigerxwîn î "RONAK" çap bû, xeberê wê gîhabû Sebrî edî ev helbeste vehandîye:

"RONAK XANIM"

Gelek dîrî ji vî warî
Te nabînim tu dijwar î
Ez ronaka dibarînim
Min ne xwarî ne vexwarî

Ji dîr hat nav û dengê te
Me ne di nexş û rengê te
Qenc û xirab tu Ronakî
Pîroz in xilş û bergê te

Te barabdin gul û guzar
Payîza dil te kir buhar
Bi navê te tîn û diçim
Li vî warî melûl û jar
Dizanim tu çi ferhengî
Çi nîfş û nîşan û dengî
Şîrîn peyvî, bilind heyvî
Evin û aşî û cengî.

Ronak pexşî, îdyolojî
Germ û geş î wek tîrojî
Ez aşîqê te me Ronak
Tu dijminê me disojî.

Li meydana feylesofî
Te dîn kirin şêx û sofî
Beg û cengiz ketin tayê
Dikin hewar "tu Miskofî."

Cigerxwîno me ke zarî
Edî ne bê kes û jarî
Şewqa te da deşt û çîya
Serê pêlê giha warî

Seyda e'jî evîndarim
Dil bi kul û birîndarim
Bi kurmançî dilûrinim
Li cem Cengiz gunehkar im.

BERHEMÊ NE ÇAP KIRÎ

Sebrî Botanî, di paşîya dîwana "Dilistan" da listeyek ji pirtûkên xwe yê nê çap kirî çêkiriye bi vî awayî:

- 1— Bilûra Çîya - dîwana sêyem.
- 2— Dibê jîn 1
- 3— Dibê jîn 2
- 4— Pîra Gerûk
- 5— Kûlîkên Mam Behdîn - şîr û çîrok ji zarokan re.
- 6— Pak û pîs "Çîrok"

Hêvîdar in ev pirtûkên han bi zûtirîn wext bêne çap kirin û çavên me bi dîtina wan geş bibin. Li dawiyê silav ji evîndarê Gulbaharê ra û her bijî bo kurd û Kurdistanê.

(1) Ev strana Gulbaharê ye û ji helbestên HAFIZ MA'Î ye.

SÊ TÎPÊN ÇAVAN

BAVÊ NAZÊ

Nivîskarê proflîtarya yê mezin Meksîm Gorkî di pîyesa "Di Binî" de gotiye: Her tişt berhema destê însan e; hemû tişt di dinê ji bo wî hatiye... Însan jêdera serbilindayî û şanazê ye.

Çiçasî peyvên hostê gotinê di ciyê xwe de ne! Bi rastî jî ma ji navê însan şêrîntir heye? Ma gelo li dinê ji mexlûkên din henin, ku şûna wî girtiye yan jî wê bigre? Gerek tenê bi name bersiv bida, heger merovên "Cîhana pêşvero" xwe roj bi roj dîrî civaka merovatiyê nekirina şevbihêrk û rehetiya xwe bi kûçîk û pisîkan re nebûhîrandana.

Bi xwe ez karim sond bixum ku me ji hez çarnigan dikir. Ez karim destê xwe li kuranê xînim, ku me jî ew ji xwe re dikirin dost. Lê niha heger em bi çavnebarî li wan temaşe dikin, sûc ne sûcê me ye. Lewra kesên ewripî hiştine, ku ev dijmintiya han nav me de çê bibe. Belê sedem ew in, çimkî di heyamê bav û kalên xwe hîn ji kevin de berî ewripîyan di malên xwe de me kûçîk dihewandin. Wan jî ji gur û dizan mal û terşên me diparastin.

Niha li wir li dervî welat halê me ne

yê hezkirina lahore ye. Digel wiha jî hîn em ji wan hezdkin. Lê em kûçikan naxin şûna zarokan û tenhaya xwe bi wan derbasnakin.

Di vir de pîrsek tê kirin: Gelo hezkirina heywanan girava insanîyeta merove? Tenê bi na ez karim bersivê bidim, tevî ku piraniya ewripîyan bi nêrinên dîn li vê pîrsê temaşe dikin.

Bi rastî jî dema hûn sikakên bajêr de diçin, yan jî di nav baxên wê de digerin, bêguman hûnê pêrgî kesên ku seyrane dikin bi kûçîk û zarokan re; bala xw bidin awirên xelkê bi çi tunê li wan dinêrin. Herdu nêrinan li heman kat de deynin berhev. Vêga hûnê çi di çavên wan de bixwîmin? Tenê xemsariyê di nêrinên ku li zarokan tîn nêrin hûnê bibînin. Ma gelo çav ne wêneyên hinava insan e? Helbet weha ye û ev peyva han ne bi derewa hatiye gotin: "Çav weneya giyana insan e." Dako vê rastîyê ji xwe re nas bikin, xeyala xwe bidin merovekî kor. Bi dirêjayî li ser rûyê wî rawestin. Gelo wê çi di biçimê wî de bêxwendin? Ma ji xeynî vala bûnê çi tê xwendin.

Dema ez û ewrupî li hev dinêrin û awirên me li hev dikevin sê tîpên çavan tîn ber çavên min: Tîpê yekem di çavên gumgumokê yê nexweşik qezûzî dibînim. Tîpê dudiya ez di çavên marmarokên de dibînim. Wiha çavên wê bi mane û runine ti di bê qey bi merov re dike. Heger Xweşik dîna xwe bidênê vêga hûnê hêrek li berherkandinê bibînin. Hêsrên wiha zelal in, mîna dîlo-pên xwînavê li ser pelên kulîlkan piştî elindê. Çaxa hîn bêtir li çavên marmarokê bê temaşekirin, ne dure ditina seyrên nûh di danê xuristê de. Tîpê sisya merov kare bibîne di çavên masiyan de. Çavên vî tîpî sar e, mîna sarbûna çavên miriyan. Merov ji wan di cefile û bê hemdî xwe mijankên xwe dişkine.

Ma gelo ewripî bikîjan tîpên çavan li me dinêrin? Ez karim bêjîm, ku ew tenê di çavên marmarokan li kûçikan temaşe dikin. Lê ew jî ne bi ruhînin çilo, ku gulên plastîk bê giyan, jîyan û bihne:

* *

SELAHADDİN EYYŪBĪ

BRĪNDAR



السلطان صلاح الدين بطل الإسلام والكردي

هذه الصورة وصورة «كريم خان» ، أخو «ذمان من (رونوي كرد)» المجلة الكردية الشهرية الصادرة في استانبول سنة ١١٣١ (١٩١٣ م) . وقد دل البحث على أن الأصل في صور صلاح الدين المنشورة في أرجاء العالم حتى الآن هو ما نقل من كتاب روسي مأخوذ من دير قديم بمصر . وبديل البنيان الاثبات لحكيم الزمان عبد المنعم الأندلسي الذي حبط مصر في عهد صلاح الدين فنظام اقتصاد في مدحه ، على أن المسيحيين في ذلك العهد رسموه ووضمو اسمه في الكنائس ؟

فعلوا بأرجاء الكنائس صورة ذلك اعتقدوها كاعتقاد الأتباع
يدرس لها نس ويرق بوصفها ويصنعه ينش به في التمام

(راجع ص ٢٣٣ من المجلد الثاني من كتاب * خلاصة تاريخ الكرد وكردستان *)

و ص ٢٠ من كتاب * حياة صلاح الدين الأيوبي *)

Salaheddîn Eyyûbî p.z. di sala 1177 an de bingeha padîşahiya Eyyûbiyan danî. Kurdistan, Armenya, Sûrya, Misir, Yemen di bin destên Eyyûbiyan de bûn. Padîşahiya Eyyûbiyan 305 salî domiya.

150 sal beri Salaheddin, filehên Ewrûpa, Qûdûs dagirkiribûn. Filistin tev stendi bûn, padîşahiyeke filehi (mesihi) di welatên islamê de li dar xisti bûn. Heta ber deriyê Şamê û Helebê ji hati bûn.

Şadi bin Merwan bapirê Eyyûbiyan bû bi xwe ji Azerbeycanê, ji kurdên 'Ravendê' û ji gundê DVİN' bû.

Di dema Siltan Mesûdê Selçûqî de, fermandarêki Siltên, Şadi bin Merwan kire dizdar (nobedarê kelehê) ê xwe, kir ê keleha Tekrit ê. Şadi bin Merwan di wê kelehê de mir, di şûna wi de kurê wi Necmedin ci girt. Li gor tê gutin, dibejin rojekê Necmeddin û brayê xwe 'ESEDED-DÎN ŞERGOH' birê ve diçûn. Ji nişkê ve jinkek derket pêşiya wan û girya. Jinikê çala zilameki, ku bê sûc tade lê kiri bû, dîkir û gazin jê dîkirin.

Esededdîn ji vê pir aciz bû û zilamê ku, tade li jinikê kiri bû, anî cem xwe û sebaba wî karî jê pirsî. Lê zilam bersiva wî neda. Ji vê yekê Esededdîn rima zillam ji dest wî girt û ew kuşt.

NECMEDDÎN radibe brayê xwe digire û meselê ji yawerê Siltan Mesûd re dibêje.

Yawerê Siltên radibe ji wan re van gotinên jêrîn dinivîsine: 'Di navbera min û merivê ku, we kuştî de, dostî û hezkirinek germ hebû. Çaxa ez û hûn bên beramberî hev, ji kuştina we pê ve ne mimkine ku, ez tişteki bi we nebine, welatê min terk bikin' Li ser vê gotinê, Necmeddîn û brayê xwe welat terk kirin û çûn Mûsilê.

Mîrê Mûsilê ÎMADEDDÎN' mewanperwerî yek germ nîşanî wan da. Îmadeddîn çaxa keleha 'Balebek' ê stend Necmeddîn kir dizdarê wê.

Dibêjin Necmeddîn merivêkî dîndar û bi aqil bû. Merivêkî dadimend û emîn bû. Wî di nava xelkê de dadimendî belav kir.

Piştî ku, Îmadeddîn mîr, bi brayê xwe Esededdîn ve ketin bin femandariya 'NUREDDÎN MAHMUD' (kurê Îmadeddîn Zengî). Nûreddîn Mahmûd hej wan kir û di navbera wan de germiyek çê bû. Paşê Nûreddîn Mahmûd femandariya leşgerî û mîrîtiya 'Humus' ê da Necmeddîn. Li Misrê xelîfê Smaili-El Adid. Ji bo belavkirina êrişa Frenkan ya li hemberî Misrê, ji Siltan Nûreddîn Mahmûd alikarî xwest. Siltan Nûreddîn Mahmûd ji bo wî karî, Eseddeddîn Şêrgoh3 caran li serê leşkerê giran şand. Cara dawî Eseddeddîn Wezirê-El Adid, kuşt û ket meqamê wezirtiyê. Lê wezirtiyê Eseddeddîn pir domnekir. 65 rojan wezirtî kir. Eseddeddîn di sala 1169 an di çû ser heqîya xwe. Piştî ew mîr, brazîya wî Salaheddîn bin Necmeddîn Eyyûb ket şûna wî. Dibêjin Salaheddîn merivêkî bi aqil bû. Çaxa bû wezîr di demeke kurt de bû xelîfê, El Adid Billah da qebûl kirin, Salaheddîn, Ji xelîfê nav û xelata 'El Melik, El Nasir' stend.

Bi vi awayi Selaheddin Misir xist bin deste xwe û ji Nûreddin Mahmûd re merivek şand û rêdana vegera bavê xwe ji bo Misrê xwest.

Dibêjin Nûreddin ev daxwaza Selaheddin qebûl kir û Necmeddin Eyyûb karê vegera Misrê kir û vegeriya Misrê. Çaxa Necmeddin Eyyûb çû Misrê, xelife-El Adid bi xwe çû pêşiya wi û bi rêzdarîke giran xêr hatina wî xwest. Necmeddin bi dîtina kurê xwe pir Sermest bû. Selaheddin jî rûmet û rêzdarîya bavê xwe girt. Selaheddin xwest ku, bavê wî li şûna wî bibe wezir lê Necmeddin Eyyûb ev daxwaz ne pejirand.

Dibêjin Selaheddin karê dewletî bi awayekî baz meşand di sala 1172 an de xelife-El-Adid nexweş ket û bi wê nexweşiyê çû ser heçiya xwe.

Piştî mirina xelife El-Adid, Selaheddin xezineyên ziv û zêrên Smailiyan bi dest xist û êdî di meşandina kar de serbixwe bû. Bi zanetî û dûrbiniya xwe dilê leşger û xelkê xweş kir û ew bi xwe ve girêdan.

Li gor tê gotin di nav wan xezînan de hejmara pirtûkên nivîsandî gehîştî bûn sed hezar cildî. Di wan deman de navbera Selaheddin û Nûreddin Mahmûd nexweş bûbû. Nûreddin çûbû Misrê û xwesti bû ku peyeyekî xwe bîne serî. Çaxa Selaheddin ev bîhist, rabû ji meriv û xwediyên xwe civatek li dar xist.

Xwarziyê Selaheddin 'Takiyeddin' (Melik El Muzaffer Takiyeddin bin Eyyûb) ji cihê xwe çeng bû û got: 'Divê em meydane nedin Nûreddin Mahmûd, divê em bi leşgerên giran li ber xwe bidin.

Bavê Selaheddin (Necmeddin Eyyûb) li dijî fikra neviyê xwe derket û wisa got: 'Ez bavê te me, ev ji xalê te Şahabeddin e, em herdû jî, ji Vanên beşdarbûne bêh-tir hez te dikin. Lê çaxa em û Nûreddin rastî hev bîn, ji rumetgirtina wî û maç kirina textê wî pêve em nikarin tişteki bikin. Çaxa Nûreddin bixwaze serê me ji jê ke, divê em serê xwe radestî (teslimî) wî bikî. Çaxa dîtina bavê te û xalê te ev tu di derheqa van mîr û zilamên dewletê çî difikirî? Welat welatê Nûreddin e. Em ji xulam û koleyên wî ne. Li gor dîtina min em niha namekê ji Nûreddin re binivîsinin û wer bibêjin: "Li gor ku me bihistiye te biryar dayî ku tê leşkerên xwe ji bo rizgarkirina vî welatî bişînin. Lê belê ne hewce ye vî kar û barî ye. Ji ber ku ez tû carî ji rîya xulamtiyê derneketime, ez girêdayî textê te me û biryaran ku tu didî dipejirin îro. Heger ji bo min şik ketibe dibê te ye bi nûr, Ya baş û li cih, ji bo ku bi destê xwe zincîrekê têxe stuyê min û min binim stara hemû cihanê. Dergeha we, xulamekî xwe bişînin.'

Selaheddin ji serî heta bi bini guhdariya amozgariya bavê xwe kir û ew ji dil pejirand. Li ser vî civat belav bû.

Çaxa Necmeddin Eyyûb û kurê xwe bi tenê man wî jî, kurê xwe re wisa got:

'Tu hê xortekî ku nikarî qencî û xirbiyê ji hev derxini. Tu hê tê ne ghiştiye ku,

meselan bine ber çavan. Ma tu nizanî ku ev mirovên vî civatê wê bixwazin tiştên di serê te de derbas dibin. Bizanibin nêta te fêm bikin û vana yeka yeka bigihînin. Nûreddin Mahmûd, wê daxwaza te ya li berxwedanê ji wire bêjin. Bê guman ev gotin wê Nûreddin aciz bike. Ew ji çî dibe mal bila bibe. Ji bo me ji Misrê derxe, wê leşgerên Misrê û Şamê bi hev re bişîne ser me. Lê gava ew gotinên ku, li vî civatê hatine gotin. Bibîhîzê û bizanibe ku, em bi wî ve girêdayine. Ewê bi hîn karê din kar û war (meşxûl) be. Bi vi awayî emê jî ji wî û ji pirsgirêkên ku derxe pêşiya me xelas

Ev gotinên Necmeddin Eyyûb rast derketi bûn. Beri ku, nama Selaheddin bigihê Nûreddin Mahmûd, gotinên ku, civatê hati bûn gotin ji Nûreddin re hati bûn gotin.

Bi vî awayî Nûreddin nêzikayî nîşanf Selaheddin da, serê xwe pê ne eşand û tevî karê wî ne bû.

Di sala (1173) an de Necmeddin Eyyûb, ji hespa xwe dikeve û çend roja di nivîna nexweşiyê de radizê û paşê ji diçe ser heçiya xwe.

Selaheddin li gor adetan rahişt darbista bavê xwe û ew li cihekî baş veşart.

Çaxa Nûreddin Mahmûd di sala 1174 an de mir, li Misrê Serbixwebûna Selaheddin tamam bû. Piştî derbasbûna demê din welatê Şamê ji tevî welatê xwe kir. Li ser xelkê van welatan ala dadimendî da pêlandin û perda aşitiyê raxist. Selaheddin di nava demi de bajarên Qûdus û Halilrahman ji Frenkan stend. Selaheddin erka (wezifa) dagir kirina welatên muxrib (welatên Afrika başûr) da braziyê xwe FERH ŞAH, kulê xwe 'KARAKUŞ' ji bi braziyê xwe re şand. Ferh şah bi leşgerêkî giran ber bi wî ali de çû û welatê TRABLUS ji Frenkan stend. Berê ev bajar di destê Frenkan de bû. Di wan deman de ji Selaheddin re mizgînek hat ku, brayê wî TURANŞAH zora padişahî Yemenê 'ABDUNNEBÎ' birî ye Tûranşah Abdunnebî di şerde kuştî bû û Yemen ji wî stendi bû.

Sûrya û Şam di sala 1175 an de keti bû destê Selaheddin. Wî çaxî jî kurê Nûreddin Mahmûd, MELIK EL SALH ÎSMAÎL, qîma xwe bi mirekiya Helebê ani bû. Selaheddin di sala 1177 an de ferman da ku bi dirêjahiya 29.300 zira (Hacetekî pivanê ye, ji anişkê heta serê tiliya navine) sûreke mezin li dora Misir û Qahire bê çêkirin. Ji bo çêkirina vî sûrê ji her ali diwarjen û xebatkar civandin. Ew diwarjen û xebatkar hetani dawiya jiyana Selaheddin bi şev û roj xebitîn.

Di sala 1178 an de Selaheddin dirêji ASKALAN û gundê dora wê kir. Gelek mal û xenimet ji frenkan stend. Paşê berê leşgerê xwe ber bi REMLE vekir. Li wir şerek dijwar di navbera wan û frenkan de çêbû. Di vî şeri de leşgerên Misilmanan bibin ketin û perişan bûn. Leşgerên Selaheddin pir hatin kuştin. Di nava wan de braziyê wî (kurê Takiyeddin) ji hebû. Braziyê Selaheddin hê-20 salî bû.

Selaheddin bi zor û heft bela ji vî şeri xelas bû û bi halekî kelegirî û perişan vegeriya Qahirê. Frenkan piştî vî lihevketinê berê xwe dan HAMA yê û çar mehan ew dorpêç kirin. (dora wê pêçan)

Di sala 1179 an de keleha Helebê kete destê Selaheddin. Wî jî kurê xwe MELIK EL ZAHÎR kire waliyê Helebê.

Di wê salê de xalê Selaheddin, Mir Şahabeddin karûbarên bajarê Hamayê dimeşand. Piştî mirêna wî, Melik El Muzaffer Takiyeddin Omer Bin Şahînsah Bin Necmeddin Eyup, ket şûna wî. Wî heta mirina xwe (1182) karûbarên bajarê Hama yê meşand.

Di sala 1181 ê de Şemsuddewle Bin Tûranşah Necmeddin Eyyub ku Yemen dagir kiri bû, mir. Paşê hestiyên wî guhestin Şamê. Li dibistana ku xweha wî li dora Şamê çêkiri bû, veşartin. Paşê mirîtiya Yemenê dan brayê Selaheddin Seyfulislam Tugtekîn.

Dibêjin rojek ji rojên sala 1188 an Selaheddin û Frenk hatin rabeî hev. Di navbera wan de şerekî xwinrêj çêbû. Ê ev şer bi serketina Selaheddin dawî hat. Generalên Frenkan piştî kuştina gelek leşgerên xwe dil ket. Piştî vî şeri Selaheddin dirêji ser AKKA kir. Selaheddin ew der jî, ji destê Frenkan stend û 4000 dîlên misilmanan azad kirin.

Selaheddin bi vî awayî berdewamiya rîya xwe kir û gelek kele û bajarên wek NABLUS, HAYFA, KAYSARIYE, NASIRA û ASKALAN stendin. Selaheddin piştî demekê bi leşgerêkî giran meşîya ser KUDUS ê. Selaheddin, bi leşgerê xwe daket aliye rohilat û bajar dorpêç kir. Wê demê 60.000 fileh li KUDUS ê rûdiniştin. Di navbera her du ordiyan de şer dest pê kiri bû êdî. Selaheddin, mence-nîq dabûn çêkirin û bi mence-nîqan li kelê û bajer xistin. Her çiqasî Frenkan li ber xwe didan jî, lê dawî cih li wan teng bû û aşî xwestin.

Selaheddin jî bo ne kuştina wan ji wan re sûnd xwar û bext da wan. Bi vî awayî Selaheddin û ordiya xwe ketin bajar. KUDUS, bi vî awayî kete destê Selaheddin. KUDUS ji sala 1100 heta sala 1188 di destê Frankan de bû.

Di navbera Selaheddin û Frankan de hîmê van mercan hati bû avêtin:

Ji filehan her peyayek 20 dînar, her jînek 5 dînar an dê bide misilmanan û ji bo her zarokê jî dînarek. Kesê ku nikaribe deynê xwe bide dê dîl têketa destê misilmanan.

Selaheddin perê ku ji Frenkan stendin, tev li leşger û fermanarên xwe belav dikirin. Paşê tevî leşgerê xwe dirêji kela SUR ê kir. Ji ber hestpbûna sûrên kelê û ji ber gazinên leşgerên xwe (ji ber sermê û baranê) Selaheddin dîtina yawerên xwe ji girt û dev ji kelehê berda. Paşê berê xwe da bajarê TARSUS ê û ew der jî bi zora şer stend.

Selaheddin paşê xwe gîhand kela Berziyê. Tebût û hestepbûna vî kelê

bûbûn destana zimanan. Ji ber ku keleh û sîrên wê ji deryê zêdeyî 570 zîra bilind bû. Lê Selaheddîn, ew ci ji bi zora şer stend. Paşê Selaheddîn berê xwe da dorhêla ANTAKYA yê û gelê wan dorhêla bi wî re aştî danin.

Paşê Selaheddîn li ser daxwaza kûrê xwe Melîk El Zahîr, ji Antakyayê çû Helebê. Melîk El Zahîr, ji bo bavê xwe şahiyên mezin li dar xistin. Piştî Helebê, Selaheddîn çû Hamayê. Li Hamayê walî Takyeddîn mêvanperweriyek mezin nîşanê Selaheddîn da. Selaheddîn jî wê mêvanperweriyê kêfxweş bû, bajarê Cebele û çend ciyên din ji da brayê xwe Takyeddîn.

Selaheddîn ji wê çû Şamê, ji wir jî meşiya ser bajarê SAFED ê. Piştî stendina bajarê Safedê, bajarên KEREK û KEVKEB jî ket bin destê wî. Piştî van bûyeran Selaheddîn çû Kudûsê. Çû ASKALAN ê, ew der ji brayê xwe stend û li şûna wir de herema KEREK ê da yê. Çaxa Selaheddîn giha Akkayê fermana nûjenkirina sîrên kelehê kir. Paşê dirêjî kela herî tebût ya li wê dorhêlê kela ŞAKIF ê, kir û ew dorpêç kir. Parêzgerên kelehê çaxa dîtin ku dê Selaheddîn zora wan bibe, rabûn ji kelehê derket û ber bi Selaheddîn ve hatin û bi zimanê erebî jî wî re gotin:

"Ger hun li Şamê destûra rûniştinê bidin me û malbatên me û salê têra deba-
ra me zêr û zad bidin me, ez dê kelehê
radestên we bikim."

Selaheddîn ew daxwaza walî pejrîrand
û walî vegeriya kelehê Leşgerên Selahed-
dîn piştê wê lihevhatinê dev ji dorpêç-
kirina kelehê berdabûn

Lê, piştî çend rojan, her kesi dît, ku
Frenkan bi wê daxwazê ew xapandine.
Frenkan, bi vî awayî tada li ser kelehê
dabûn rawestandî. Wan ji hundir de
sîrên kelehê nûjendikirin. Û Keleh bi
tiştên hewcedariyê ve dadigirtin. Li
hember wê bûyerê leşgerên Selaheddîn,
cardin kelehê dorpêç kirin. Di wê demê
de nûçeyek ji Selaheddîn re hat, ku leş-
gerên "XAÇÎ" bi awakî giran gihane le-
mana Akkayê û keleh dorpêç kirine.
Li ser wê bûyerê Melîk El Adîl li ser hin
mercan bawer bûbû. Li gor lihevhatina
wan:

"Diviya bû, hemû çek, lawir û 200.
ooo dînar ji Frenkan re bihada dan. Ji
dîlên bijarte 100 û yên din jî 500 kes
bên berdand. Li hember wê misilman bi
awakî bê şer ji bajêr bihatana berdand."

Selaheddîn li hember wê nûçê, bi şê-
wirdarên xwe şewirî û biryara vegera
şerê XAÇÎ yan da. Lawekî ji yê Selahed-
dîn Melîk El Efdal ku waliyê Şamê bû,

fermana derketina bajêr da bû, xelkê mal
û hebûnên xwe bi niv bihayî difrotin.
Leşgeran dest bi xirabkirina bajêr kiri bûn
û heta bi deryê bajêr şewitandi bûn.

Ev tişt li kelehên LUDD û REMLE jî
hati bûn kirin.

Di wê demê de ji Selaheddîn re, nûçek
ji Melîk El Adîl hat.

"Ger em bajarên li kenarên deryayê
ji Frenkan re berdî, dê bi me re aştî-
yê çêkin."

Selaheddîn ev tişt qebûl kir û destûr da
Melîk El Adîl.

Bi vî awayî di navbera her du aliyan de
aştî çêbû. Her du aliyan ji hev re sûnd
xwarin. Êdî ji her du aliyan jî tacir û
xelk di nav bajêr de digeriyan. Selahed-
dîn, destûra bêhn vedanê da kurê xwe
Melîk El Efdal û leşgerên wî vegeriyan
bajarê xwe.

Selaheddîn jî paşê vegeriya Kudûsê û
çendekî li wir ma. Paşê çû Şamê. Li wir
kurên wî û fermandarên wî tev di bin
fermandariya wî de civiyan.

Li gor tê gotin, sala 1193 an rojek ji
roja inê, Selaheddîn, diçe pergî hec-
yan. Paşê Selaheddîn, tagirtî vegeriya û
nexweşket. Selaheddîn piştî demekê bi
wê nexweşiyê çû ser heqîya xwe.



Ahmet Canteekin 21.07.1981

DE RABIN RABIN

Bindesta da ez dimînim
Ez birîndar, dilbirîn im
Rabin xortên qenc û ciwan
Min ji bindestan derîn in.



Pir millet dijîn serbixwe
Ez di bindestê vegirkar, beg û axa
Hêviya min keç û lawin
Rabin çuga bidin ber xwe.

Jîna bindest qet ne xweşe
Mirov ne baş, tim nexweşe
Ku tu zep bikî azadî
Tê bibinî ew çi qes xweşe.



Bê xwendin tu ne seydayî
Bi şev, bi roj tu koleyî
Qet ne xweşe bindesta da jîn
Bav û dê tu bo çi dayî?



Kurdistan kirin çar alî
Bi mêrkujî, bi zordarî
Xwînmij yê belîne
Vegirkar û emperyalî.



Ma ew mêrin, em mêrokin?
Li ser me ew kon vedikin
Te digot ez mêr û pêtim
Ma em nikan wan çebikin?

Tu rabe, tu xweş bimeşe
Bila kela dijmin biweşe
Çavê gewrê dûra ramûse
Welat, serxwebûn pir xweşe.



Tu bixwîne, bi zane be
Şoresger be, can fêda be
Divê em azad bibin!
Sed tifil jîna bindesta be.



Kurd, Ermenî û Asurî
Em birane dayik gorî
Destê xwe di destê hevkin
Rewş dijware ma tu kurî.



Ma tu çawa karî bijî
Bindestî, tu ne li dijî?
Çîna karker tu nabizî?
Gelo rabin dij xwînmijî.

Kurder i cupmatch

Av JANKÄLLMAN
DN:s Göteborg

Ett 20-tal 'en match kan jag inte stramtolerera. Det här var det värsta mat. jag varit med om någonsin under IFK (jag varit med om någonsin under kiska menade Kalman Meszloy, som bahep. är född i Ungern men just nu jobbar som tränare för turkiska laget Fenerbahce.

Vid tre andra halv... den andra halv... de demonstranterna i... plakat och banderoller på Ullevi gräsmatta. De protesterade mot att Kurdistan inte blir självständigt.

På plakaten stod slagord - "mot den fascistiska diktaturen" - i Turkiet. Trots en fördubblad polisstyrka på Ullevi kunde polisen inte hålla tillbaka demonstrationerna utan de hoppade över staketet.

Omspel krav

Efter matchen menade Fenerbahces tränare Kalman

uppbad journalister från turkiska tidningar har bevakat portretet i Göteborg och rapporterat hem. Nu befalar IFK Göteborgs lagledning att det kommer att bli mycket besvär vid returmotivet i Istanbul om två veckor.



Den turkiske spelaren Cem för demonstranterna att lämna platsen mot IFK Göteborg i Europacupen.

här matchen omspelad, menade tränaren.

Hela den turkiska lagledningen har varit mycket upprörd under sitt besök i Göteborg. Det började med att fyra av lagets spelare genomgick en hård kroppsvisitation vid ankomsten till Landvetter.

Tullen kroppsvisiterade spelare som fick gå ut på gatan. En turkisk säkerhetspolis ska ha hårdt ord med de turkiska spelarna som protesterade vid Europacupen. Riksbombförhållningarna innebär att arrangörerna inte får spela sina matcher på hemmaplan eller utan publik i fortsättningen.

Meszloy att det var demonstrationerna som gjorde att hans lag förlorade matchen med 4-0. När vi kommer till Sverige och blir kallade fascistiska och matchen störs kan vi inte spela fotboll. Vi ska försöka få den tre gånger.

Stämningen i Turkiet är också mycket upprörd efter matchen på Ullevi. Tränaren Meszloy vägrade att tacka någon i IFK Göteborg för matchen.

Stämningen i Turkiet är också mycket uppgjagd. Ett stort

DI LISTIKA FOTBOLÊ DE DEWLETA TIRK HAT PROTESTO KIRIN

Dı roja 23. 10. 1985 an de taxuma tırkan a futbolê Fenerbexçe û ya Swêdiyan Goteborgê, li bajarê Goteborgê maç kîrin. Maça kupa Ewrupayê bû.

Hêj ji roja maçê re gelek mabû, ku tirkên ku li welatên Skandinavyayê dijîn bî erebe, trê n û otobusan berên xwe dan bajarê ku maç li wir dilize, Goteborgê. U her wisa rojname, radyo û televizyona tirk a li Swêdê heftek beri maçê programên taybetî çêkîrin û weşandin. Wan dî programên xwe de Aql û fikir didan taxuma xwe Fenerbexçe; şîretan lê dîkır û rê pê şandîdan... Oaşo moral didan listîkvanên xwe û fortên Fenerbexçe dîkîrin.

Bî destpêka listîkê re, taxuma tirk Fenerbexçe, li hev geriya û korefam bû. Taxuma swêdiyan êrişên dijwar û zor bûn ser qela Tirkan. Listîkvanên tirk, dest bî pevçûn û qebedaytiyê kîrin. Taxuma tirk 0-4 listîkê wenda kir.

Kurd ji, weki temaşevanên li pey qela tirkan ci girtî bû. Dî nivê listîka duyemîn de kurdan li dij rejîma Tirkîyê panqer û filemayên xwe vekîrin. Li dij rejîma Tirkîyê sloganên bang kîrin û qirîyan... U çend kurd xwe dî ser tîlên der dora sahê de hundirê saha futbolê û filema "BIMRE FAŞİZM, BİLİ SERXWEBUN" vekîrin. Polis wan bî zor ji sahê derxist der. Li du derxistina wan kurda, çend kesên din ji bî ala Kurdan derketin nav sahê. U sloganên avêtin. Polisê Swê wê wan ji sahê derxistin der.

Ew bûyera ha dî radyo û televizyona Swêdê de hat weşandin. Ji bil rojnameyên swêdî gelek rojnameyên dewletên din ji, nûçe û şîrovekîrîna wê bûyera ha nivisandin. Ev bûyera ha ji bo kurdan gaveke pêşkêti û çak bû. Bala awîra gelemperîya Swêd û ya Ewrupayê kîşand ser doza gelê kurd.

KOMELA ÇANDA KURD LI BOTKYRKAYÊ ŞEVEKE GİRSÎ ÇÊKİR

Komela Çand a Kurd li Botkyrkayê, dî rîja 26 ê meha 10 an de li herêma Fittiyayê şeveke gelek mezûn û hêja pêk ani.

Heta iro li wê herêma ha şeveke wîha girsî û bî program ne hatî bû pêk anin. Bî rasti şeva Komela Çand a Kurd li Botkyrka, şeveke gelek dewlemend û rengin bû. Giringbûn û hêjabûna şevê yek ji ev bû, ku piraniya malbatên kurdên li Botkyrkayê dî şevê de beşdar bûbûn. Beşdarbûna karker û xebatkarên kurdên wê herêma ha, ji bo xebatêb pêş gafeke gelek giring e.

Şivan, Gullistan, Brindar û heval bî stran û meqamên kurdi şevê jîyandar û xweş kîrin. Koma Narin û Koma Şengal bî govend û reqsên kurdi şevê hin ji geş û xweş kîrin. Ji komita şevê re gelek mesaj û silavnamên serketîni û serfiraziyê hatin. Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê dî şevê de beşdar bû û mesajek şevê pîroz kîr.

LI BAJARÊ STOCKHOLMÊ NİJADPERESTÎ HAT PROTESTO KIRIN!


Dîroja 19 ê meha dehan 1985 an de, li serbajarê Sêdê li Stockholmê bî mîting û meşeke gursî, nijadperestî hat protesto kîrin.

Ew tevgera ha, ji aliyê "Komita li dij Nijadperestiyê" ve hat organize kîrin û dagerandin. Ev komita ha gelek fîreh û bî hêz bû. Bê hejmar nûnerên rêxistinên biyanîyên din ji dî nav komitê de ci girtine an ji, ji der ve bî şêleke aktif ji komitê re alikari û piştgriyê dîkîr.

Federasyona me ji, bî şêleke aktif beşdarê karûbarê komitê bû. Federasyona Kurdan dî mîting û meşê de ciyê xwe girt. Federasyona me, bî filema xwe dî meş û mîtingê de ci girt.

Mîtingê, li bajarê Stockholmê li meydana Sergel Torgetê seet dî 13.00 an de dî destpêkîr. Dî mîtingê de gelek kes bî swêdi axaftin û nijadperestiyê protesto kîrin. Axaftvanan, dî axaftinên xwe de li Swêdê ji hinek gruhên biçûk yê nîjadperest ku li dij biyanîyan xebatên nijadperestiyê dîkîr protesto kîrin û ji hukmatê daxwarkîna rawestandîna karûbarên wan kîrin. Bî meş û sloganên internasyonalîst û biratiya gelan, seet dî 14.00 de meşê destpêkîr. Meş gelek baş derbas bû.

JÎ KURDÎSTANÊ NÛÇE Û BÛYER



Îçişleri Bakanı Yıldırım Akbulut, silahların alımı için açılan ihalenin bittiğini söyledi.



Îçişleri Bakanı Akbulut, için emniyet güçlerinin "donatılacağını açıkladı

Polisin

karanlığı delo



CUNTA BERÇAVIK Û
HALETÊN ŞEVÊ DIKRE

Cunta û hukmeta xwe ji bo tekoşina şoreşgeran her roj tedbirên nû digrin.

Cunta faşist û hukmeta xwe, ji bo rawestandina tekoşina şoreşgeran her roj hin tedbirên nû digrin. Ji van tedbiran yek ji, di van rojên dawî de, di warê teknîkî de pêwestiya hinek haletên nû yê ku bikaribin bi saya wan de hin dijwartir li dij şoreşgeran operasyonan pêk binn. Bi taybetî van haletan di şevên tari de bi akar tinn.

Cunta û hukmeta xwe ew haletên ku niha bîkîrin ev in:

Berçavikên tarîtiyê... Ev berçavik di tarîtiyê de gelek baş dibin. Yeka wan berçavikan 40 milyon lireyê tirk e. Li gor plana cuntayê dê di cara yekem de 100 berçavik ji Amerika Yekbûyî bîkîrin. Ev berçavikên ha cara yekem leşkerên Amerika Yekbûyî li Vietnamê bi kar anibûn. Polisê Amerika van berçavikan bi kar tîne. Parazgerên Amerika yê tixûbên Meksîka bi van berçavikan, ew kesên ku bi qaçaxî di tixûbê derbasê Amerika dibin wan digrin. Niha ji polisên tirk dê van berçavikan bi kar binn.

Haletê duyemîn ji, di tarîtiyê de kare hedefê bîbine û nişan bigre. Û hev herdu halet hev temam dîkin. Yek ji dîr ve dibine û ya dîm ji, ji dîr ve nişan digre û li nişanê dixê. Dewleta faşist van haletan dê di tixûbên Kurdistanê de û di operasyonan de bi kar bine.

Di derheqê van berçavik û haletên dîm de wezîrê karûbarê hundirî Yıldırım Akbulut, daxwuyaniyek da rojname, radyo û televizyonan, ku dê di demeke gelek nêz de qasî 200 haletên berçavik û yê nişanê ji Amerika Yekbûyî bîkîrin.

Li Tirkîyê û li Kurdistanê her ku diçe şer û tekoşina netewî û çini geş û xurt dibe. Cunta û hukmeta xwe ji zor didin tedbir û teknîkê. Lê, teknîk ji wan xilas nake. Dawiya wan nêz e.

LI TIRKIYÊ, BI DERKETINA ZAGONA POLİS RE, POLİSÊ TIRK BÛ XWEDIYÊ VATİNÎ Û BERPIRSIYARIYEKE GELEK MEZİN Û FIREH. QET SAZGEH Û KESEKÎ FERMÎ NIKARE JI POLİS HESAB PIRS BIKE. BÊ RÊDANA DADGEHÊ, POLİS KARE ŞENDIQAN, KOMELAN, RÊXİSTINAN Û MALAN BIGRE Û WAN BIKE BIN KONTROLÊ. BERPIRSIYAR Û ENDAMÊN WAN BIGRE Û LI WAN ÊŞKENCE BIKE. POLİS KARE LI NAV BAJÊR, LI KUÇÊ Û KOLANAN BÊ PIRS Û BÊ DADGEH MERIV BUKJE.

DEWLETA POLİS Û LEŞGER NIHA JÎ, BI BERÇAVIK Û DÛRBİNÊN TARİTİYÊ RÊXİSTINA POLİS JI ALİYÊ TEKNİK VE NÛJEN DIKE.

LI TIRKIYÊ HEJMARTINA GIŞTÎ ÇÊBÛ

Dî meha bori de, lî Tirkîyê lî ser navê hejmartina giştî KONTROLA GIŞTÎ çêbû. Jî derê nav tu têkili û Eleqa wê bûyerê û hejmartina giştî bî hev tune bû. Jî her alî ve hejmartina şoreşger û welatparêzên kurd û şoreşgerên tirk bû.

Cunta faşist lî ser navê hejmartina giştî, bî alikariya pîsporên Amerika Yekbûyî û MÎT a xwe gelek pîrsên giring jî hemwelatîyan kir. Bî wan pîrsên ha, bî hêsaya birûbaweriyên her kesi tê fam kirin. Pîrs wiha gelek vekrî dihatin pîrs kirin:

" Birûbawerîya te ya siyasî çî ye, dî malbata te de şoreşger hene, hevalê te ki ne, ciyê karê te lî ku ye, tu kurdi dizanî? ...ûhw."

Bî rastî ev ne hejmartina giştî bû, kontrola giştî bû. Heta iro ew hînek kesên şoreşger, welatparêz yê ku ne hatî bûn ditîn û tespît kirin, cunta dixwaze wan kesan tespît bike û bigre. Ya din cunta dixwaze kesên pêşverû û welatparêz yê ku heta iro ne hatine deşifrekirin wan derxe navê û jî şûn de wan bike bin kontrola xwe. Deriyê kar û xwendegehan lî wan kesan bigre.

Cuntayê bî vê metoda xwe ya ha, lî Tirkîyê û lî Kurdistanê Tirkîyê 51,1 milyon kesi tespît kir.

PARTIYÊN KEMALIST LI KURDISTANÊ CIRÎT DAVÊJIN

Lî Kurdistanê Tirkîyê her ku diçe muhalefeta lî dij cuntayê zêde dibe. Wek demên berê disan Kemalîstên sivil dixwazin vê dijîti, berberî û tekoşînê nerm bînin, bînin rawestandî.

Bû çend meh ne, ku du partiyên Kemalîst û kolonyalist (SODEP û HP) jî bo yekbûna Kemalîstan kar û xebat dikin. Dî dawî de jî biryara yekitiyê girtin. Bî biryara yekitiyê re, serokên her du partîyan berê xwe dan Kurdistanê. Serokê partiya SODEP kurê Îsmet İnönüyê nijadperest Erdal İnönü û destbîrakê xwe lî Kurdistanê çerx dibin. Lî bajar û navçeyên Kurdistanê cîvanan pêk tînin. Ew dixwazin disa lî ser navê demokrasiyê dek û dolaban pêk bînin. Gelê kurd yê xîzan û bîndest cardin bixapînin. Lî Kurdistanê dest bî fortan û derewên demokrasiyê kirine. Dem dema demagojiyê û derewan e.....

LI TIRKIYÊ DI 29 ROJAN DE 29 CAR ZEM ÇÊBÛ

Lî Tirkîyê, dî 29 rojan de, 29 car zem çêbû. Serokwezîrê Tirkîyê Turgut Ozal, vê zem û buhabûniya ha ya nedîtî normal dît. Rojnamevanên tirk, dî vê babetê de jî Turgut Ozal pîrs pîrsin. Wî, bî awakî

vekrî û bê şerm wiha berîva pîrsa wan da:

— Ma çî bûye? Zem tîştêki gelek normal e. Xelkê me êdî fêrê zemê û buhabûnê bûye. Zem hebe û tune be jî xelkê re xem û derd nîn e....

Xwefiroşê monopolên gîrîgîr û yê Amerika Yekbûyî Turgut Ozal, dî televîzyonê de lî nav çavên xelkê xîzan û reben raste rast dinêre û wîlo bê şerm û bê tîrs dipeyive. Lî ser peyva Turgut Ozal bî hezaran kes, bî telgraf û naman Turgut Ozal û cuntayê protesto kirin. Lî Tirkîyê û bî taybetî lî Kurdistanê Tirkîyê gelê xîzan birçî û perîşan e. Gel dî rewşeke gelek xîrab de ye. Ê her ku diçe lî dij cuntayê û lî dij kirdayetiya wê roj bî roj kin û rîka xelkê zêde dibe.

REWŞA AWERTE BES DÊ LI KURDISTANÊ BÊ DOMANDIN

Lî Tirkîyê Konseya Ewlekariya Netewî civîya û lî herema Tirkîyê, biryara rakirina rewşa awerte (urfî idare-rewşa leşgerî) girt. Konseya Ewlekariya Netewî, bî tenê lî herema Kurdistanê biryara domandina rewşa awerte da. Konseya generalên faşîst, vê biryara xwe ya ha pêşkeşî parlamentoya Tirk kir. Dî vî wari de dî nav serokwezîr Turgut Ozal û Konseya generalan de ditînen cûda hene. Serokwezîr Turgut Ozal û kirdayetiya xwe dibêjin, ku " bîla bî Kurdistanê re

lî bajarê Stanbolê jî rewşa awerte dom bike." Jî ber ku lî bajarê Stanbolê kontrolkirina şoreşgeran ne hêsa ye. Her roj lî bajarê Stanbolê lî dij faşîzmê tevger pêk tînin. Lê general, bes Kurdistanê jî xwe re xetere dibînin.

Dî van pênc salên dawî de, dî nav gel de hêjabûn û gîranbîhayîya ordiya tirk gelek şikest. Jî berê ve politîkayê Dewleta Tirk heyê; ku ordiya xwe, dixwaze bî ser her tîştî ve bigre û her wiha bî ser politîka dewletê ve jî. Bî salan ve wîsa propaganda hatîye kirin, ku gelek kes bawer dîke ku tîkîliya ordiya tirk û siyaseta bî hev nîn e. Dema Tirkîye dikeve rewşeke gelek xîrab û ne derketî, ew çax ordiya tirk wek pêxemberek digîşe alikariyê U jî ber vê yekê dî her 10 salan de carek ordiya tirk derbeke dîke û pîraniya kesên pêşverû digre dukje û bê zerar dîke û vedigere çîşla xwe. Xwe jî çavê gel naxê... Iro jî rewş wiha ye. Ordî dî çavên gel de rewşa xwe ya berê wenda kirîye. Niha gel baş dizane ku dijminê gelê tirk û kurd ordiyê. Heta ku ev ordî hebe çet rîzgarbûn nîne. Demokrasiya burjuvazî jî nîn e. Jî ber vê yekê ordî dixwaze jî derê Kurdistanê, lî ciyên dîm bîkîşe çîşla xwe û disa navê xwe yê qehreman(!) bîparêze. Xwe disa çend salan verşêde.

xemginiyek!



GELÎ XWENDEVANÊN DELAL!

DEMA KOVARA ME LI BER ÇAPÊ BÛ, ME NÛÇEKE SAR-REŞ YÊ DIN JÎ BIHÎST. PROF. QANATÊ KURDO ÇÛ SER HEQIYA XWE! DI LAŞ Ê RIHÊ GELE KURD DE BIRÎNEKE DIN JÎ VEBÛ!

EM XEMGÎN IN! EM JI MALBATA WÎ Ê GELE KURD RE SERXWEŞI DIXWAZIN!

EM DÊ DI HEJMARA XWE YA 7/85 AN DE DI DERHEQÊ JÎNENÎGAR, TEKOŞÎN, EFIRANDIN Ê MIRINA PROF. QANATÊ KURDO DE DÛR Ê DIRÊJ BINIVÎSÎNIN...

BERBANG



ŞEVA BERBANGÊ

GULA MALAN ZAROKÊN HÊJA!

ME, DI HEJMARA BERBANGÊ YA 5 / 85 AN DE JÎ NIVISANDI BÛ, KU ME LECEKE VEKIRÎ YE. EV LECA HA DE HETA ROJA 15.12. 1985 AN DOM BIKE. Û DÊ DI ROJA 11. 01. 1986 AN DE JÎ ŞEVA BERBANGÊ ÇÊBE'. DI ŞEVÊ DE DIYARIYÊN LECE BÊN DAYÎN. LECA ME, JI SÊ BEŞAN PÊK TE.

*BEŞA HELBESTAN

*BEŞA ÇIROKAN

*BEŞA WÊNAN

ME DI HEJMARA BERÊ DE JI BÎR KIRI BÛN Û NAVÊ BEŞA WÊNAN NE NIVISANDI BÛ. HER BEŞEK SÊ DIYARIYÊN WÊ HENE. YA YEKEMÎN, DUYEMÎN Û SÊYEMÎN. HER ZAROK KARE BEŞDARÊ HEM Û AN JÎ YEK DUDUYAN BIBE. HUN BI DILÊ XWE NE!

DI PEY BANGA ME RE GELEK ZAROK BEŞDARÊ LECE BÛN Û DIBIN. LEC DOM DIKE. JI KOMÎTA LECÊ Û ŞEVA BERBANGÊ HETA NIHA GELEK HELBEST Û ÇIROK HATIN. DAXWAZA ME EV E, KU PIRANIYA ZAROKÊN KURD YÊN KU LI SWÊDÊ DIJÎN BEŞDARÊ LECE BIBIN. EW ÇAX DÊ HÎN ÇIROK, HELBEST Û WÊNE YÊN HÊJA DERKEVIN RASTÊ.

EM JI WE RE SERKETIN Û SERFÎRAZÎ DIXWAZIN!
BENDA HELBEST, ÇIROK Û WÊNE YÊN WE NE!..

KOMÎTA ŞEVA BERBANGÊ

FERHENGA BERBANGÊ

XWENDEVANÊN HÊJA!
 FERHENGOKA, BERBANGÊ NE TENÊ FERFENGA PEYVAN E. LÊ BELÊ
 NAV JÎ TE DE HENE. HER WÎSA EV NAV U PEYV – YÊN KU ME PÊWÎST
 DÎTÎN – EM ŞIROVEKÎN TENÊ EW IN, YÊN KU DÎ NÎVÎSARÊN BERBANGÊ
 DE DERBAS DÎBÎN.

A

Amêdî: Bajarek li Kurdistana Başûr.

B

Belavkirin: Weşandin
 Berhem: Efirandin, eser
 Berkeftî: Hêja

C

Cengîz: Kurtkirina navê Cengîzخان e,
 li vir " di helbesta Botanî de"
 mebest dagîrkerên Kurdistanê ne

D

Dadgeh: Mahkeme
 Dilsoz: Muxlis
 Dozex: Cehnem

E

Enwer MAÎ: Nivîskar, dirokzan û hel-
 bestvanekî kurd e û jî kurdistana Başûr e.
 Ew di sala 1913 de bûye û di sala 1963
 an de şehîd bûye.
 Ewle: Parastin

F

Fermî: Resmî

G

Gedahî: Parsekî

H

Hevberkî: Muqayese

M

Mebest: Mexsed
 Mexfiyat: Nepenî, nihênî
 Mukum: Bi hêz

N

Nûjen: Modern

R

Rêdan: Îzin
 Ronak Pexşîn: Ronahîdan
 Rondik: Firmêsk, hêsir
 Resen: Xorist, esil

S

Sazgeh: Muessese

Ş

Şirovekirin: Ronîkirin
 Şeyda: Aşiq
 Şehsiwar: Siwarê çeleng
 Şu'le: Rivîn, xetir

T

Temen: Emir, jî

V


Vatînî: Wezîfe
 Vehandin: Hunandin

W

Weheye: Dibe
 Werz: Demsal, kej

ee

Ew in ku ji hazar salan,
 Li ser serê me bela
 Di emya me de girêf
 Û delemceyên sitûr in,
 Li ser destê me yî
 bihûner de.”
 (O.K)



ADRESS/NAVNIŞAN:
RISSNELEDEN 55,NB
172 44 SUNDBYBERG/SWEDEN

YILMAZ Ü CIGERXWIN NEMIR IN!

